


ÇEND BIWÊJ Û GOTINÊN  
PÊŞÎYAN ÊN AJMANÛKÊ

OMER BEXTIYAR



ÇANDA MIRÎYAN

ZİWER ÎLHAN



XERABREŞK: PERESTGEHA  
HERÎ KEVNAK A CÎHANÊ

XERZÎ XERZAN



# ÇANDNAME

E-KOVARA SÊ MEHANE YA MALPERA [WWW.CANDNAME.COMÊ](http://WWW.CANDNAME.COMÊ) • JIMAR 1 • 2018 ADAR•

LI PEY ŞOPA BAV Û KALAN  
BI RENG Û DENGÊN JÎYANÊ



# BI SILAVÊN GERM

## JI EDÎTORYAYÊ

### ÇANDNAME

e-kovara çanda kurdî ya sênehane  
jimar 1 • adar 2018

**Xwedî û Berpirs**  
Firat Bawerî

**Edîtorya**  
Paşa Amedî, Omer Bextîyar,  
Firat Bawerî, Abdullah Araf  
Ridwan Xelîl

**Redaksiyon**  
Omer Bextîyar

**Bergsazî û Rûpelsazî**  
Ridwan Xelîl  
ridwanxelil@gmail.com

**Navnîşan**  
www.candname.com  
candnamekovar@gmail.com

---  
Nivîskar ji nivîsên xwe,  
Xwendevan jî ji xwendina xwe  
berpirs in. Lijneya kovarê dikare li  
ser nivîsan serastkirin û guherîna  
çêbîke. Her nivîsa ku hatiye şandin  
dibê ku newê weşandin.

Merheba ji we re Kurdînus û xwînerên hêja...

Ji ber ku me bi xebatek wiha silav da we pir kêfxweş û bi kelecani ne. Hêvî dikin ev kelecani û kêfxweşîya me her dem dewam bike.

Koma me bi navê malpera "www.candname.com"ê ev du sal in di xizmeta gelê xwe de bû. Piştî tecrûbeya du salan bi hevalên ku malperê birêve dibin re me biryar da ku em bi navê malperê, e-kovarekê jî derxin û bo çand û zimanê Kurdî xizmeteke din jî bikin.

Çima e-kovar?

Yek; em dixwazin ev xebat li sînoran neeliqê û di heman demê de li her derê dinyayê belav bibe û kengî Kurdek bixwaze xwe bigihîne vê xebatê divê bi sê-çar pişkên kompîtirê karibe.

Dudo; wek tê zanîn xebatên Kurdî yê çapkirî bi zor û zehmet tên belavkirin û gelek caran jî mixabin weşangerên wan xebatan dikevin nav zirar û zîyaneke aborî. Ji ber vê yekê heta niha gelek xebatên Kurdan di nîvî de mane an jî piştî hejmara yekem derfet nedîtine ku hejmara duyem biveşînin.

Armanca malpera "candname"yê ev bû ku beyî sîyasetê tenê bi çandê; ev çand çî çanda kevn û çî ya nû be, ji bo kelepora Kurdî bibe war û welatek û tê de bi rihefî û azadî geş bibe. Di vî warî de, em ji hemû şopîner, xwîner û nivîskarên xwe re spasî û minetên xwe pêşkêş dikin ku ji destpêkê heta niha eleqeyek mezin nîşanî me dan. Mala wan hezar caran ava be.

Ji bo kesên ku di jimara me ya pêşîn de em tenê nehiştin û bi gotar, helbest, nivîs û lêkolînên xwe tevî vê xebatê bûn re em carek dî spas dikin. Xwedê derdan nede dest û pîyên we, Xwedê qelema we bi hêz, hibra we bêdawî bike..

Kovara Çandnameyê ji 3 mehan carekê tê weşandin. Mehek ji bo nivîs şandinê, mehek ji bo sererastkirin û rûpelsazîya kovarê û di dawîyê de mehek jî ji bo danasîn û belavkirina kovarê ye.

Lê ji niha ve, em bangî hemû Kurdînivîsan dikin, ger bixwazin nivîsên wan di Kovara Çandnameyê de bînin weşandin, dikarin nivîs û xebatên xwe ji bo navnîşana elektronîk ya çandnameyê re bişînin. Tenê di peyama xwe de dîyar bikin ka nivîs ji bo kovarê an ji bo malperê şandine. Navnîşana me ya elektronîk ev e: candnamekovar@gmail.com

Ji ber ku platforma Çandnameyê platformeke azad e, naxwaze zêde tevî nivîsên nivîskarên xwe bibe û ji ber ku paşxaneya her xwînerî ji ya yê din cudatir e dibe ku ji heman nivîsê kesên cuda tiştên cuda fehm bikin. Ji ber van sedeman wek dirûşmeke çandnameyê em dikarin bibê-jin, "Nivîskar ji nivîsên xwe, Xwendevan jî ji xwendina xwe berpirs in."

De îja kerem bikin... Heta hejmara duyem bimînin di nav xêr û xweşîyê de...

Edîtoryaya Çandnameyê

# NAVEROK

Ji Edîtoryayê.....	2		
Çanda Mirîyan .....	5	Ne Xêra We û Ne jî Xirabîya We .....	30
Zîwer Îlhan		Mela Mihyedîn	
Çend Biwêj û Gotinên Pêşîyan Ên Ajmanûkê.....	7	Di Malbatê de Têkilîyên Jin û Mêran .....	32
Omer Bextîyar		Fatma Güneş Savluk	
Meseleya Rê.....	13	Di Geşedana Zarokan de	
Eylem Akıncı		Helwesta dê û Bavan û Kesayeta Zarokan .....	34
Hecî û Ömür .....	15	Ayetullah X Hasanoglu	
Remzî Reşanî		Nesaxîya Kesayeta Paşkêş/Şermîn .....	36
Şîrê Mitirban .....	16	Wergera bo kurdî OMER DILSOZ	
Aram Rênas Yaman		Nexweşiya Perîzade (Guatr) .....	38
Mirovê Pendstend.....	17	Koma Bîyolojiya bi Kurdî	
Mustafa Rêzan		Mirov Çima û Çawa Tî Dibe?.....	39
Kera Mirî ya Pişkê .....	19	Koma Bîyolojiya bi Kurdî	
Ridwan xelîl		Tehtên Bilind Çîrok e yan Kurteroman e?.....	41
Sed Gotinên Pêşîyan .....	20	Lokman Polat	
Paşa Amedî		Xerabreşk: Perestgeha Herî Kevnar a Cîhanê .....	44
Mişkê Zengîn .....	22	Xerzî Xerzan	
Maşîta Amedî		Sînemayeke Derengmayî: Sînemaya Kurdî .....	46
Birîna Pîrê.....	23	Mûrad Cango	
Paşa Amedî		Sînemaya Bêwelat: Sînemaya Kurdî.....	48
Helebçe .....	25	Dilazad Art	
Berken Bereh		Têkoşerîya Çandê,	
Ya Resulelah .....	27	Têkoşerîya Herî Sext û Dijwar e.....	52
Dilbikulê Cizîrî		Agirî Soran	
Ez Zarok im .....	28	Xetereya Sîyasetê li Ser Kurdî .....	54
Qasimê Xelîfî		Azad Selem	
Rondikên Me Yek Reng in .....	29	Rayeka Lêkeran Çawa tê Bidestxistin? .....	56
Mehmet Aydın		Bawer Agirî	





**BI DESTPÊKA SALA NÛ**

**BI DESTPÊKA ROJA NÛ**

**BI DESTPÊKEKE NÛ**

**MERHEBA JI WE RE...**

**JI ROJHILAT HETA ROJAVA**

**JI BAKUR HETA BAŞÛR**

**NEWROZA WE TEVAN PÎROZ BE!**



# ÇANDA MIRÎYAN

ZÎWER ÎLHAN



Xêr li mirîyan dibe, zindî ji gencîyê fêr nakin. Ez xwarina wan derdixim, şîva wan çêdikim, mewlûda wan didim. Zindî bi xêra mirîyan têr dixwin!

Ez hezkirê mirîyan im. Ez ji wan hez dikim ne ji xwe. Evînên mirîyan bêtir dibin mînak. Dengbêj û qesîdebêj, şer û destanên wan distirên. Ku em helbestan dinivîsin, ji bo şibandina me bihêz be em hewceyî evînên mirîyan in. Çi di dilê min de be, ez li wan bar dikim. Çi tiştê ku ez nikarim bibêjim, dixim stûyê wan; lewra ew napeyivin. Evîna wan î mînak, ji min re formeke klasîk in. Bi xêra wan ez dibim xwedîyê berhemên edebî. Bi xêra wan ez dibim xwedî esalet.



Ez xwedîyê mirîyan im. Ez wan dikirim û difiroşim, hayê wan jê nîne.

Ez mîratxûrê mirîyan im. Çi entîqê ji wan mabe, ez difiroşim. Nanê me jê derdikeve. Ez wateya hebûna xwe tê de dibînim. Erdê wan ji min re dimîne, mal û milkê wan ji min re maye. Ez derewînê mirîyan im. Min tecrûbe û dîroka wan ji xwe re kirîye kar. Ez tahma jîyana xwe tê de dibînim. Destxet û kitêbên ku ji min re mane, nadim bi malê dinyayê tevdf. Ez hineka diweşînim, tîpê hineka diguherînim, hineka jî werdirgerînim. Çavê min zahf dibetilin; lê divê mirov li mîrata bav û kalan xwedî derkeve. Ez hin berhemana dikim filîm, hineka dikim şano. Naveroka hin berhemana ji min re dibe roman. Helbest, di derheqê hestên min î hezar salî de ne. Ev çîroka me tevda ye.

Di vê çandê de heta tu nemirî, tu bi qîmet nabî. Ku helbestvan dimire bi qîmet dibe. Kitêbên nivîskarên mirî, bêtir tèn firotin. Em wisa dixwazin mirî bêtir bijîn.

Ez lêkolînerê mirîyan im. Li gorîstanê navnetewî li binyata xwe digerin. Herdem li cûreyên xakê rast tîm. Paşeroj xak, pêşeroj xak ku ne ev rih ba... Ez zarokê mirîyan im. Mirî bêtir li bal hev in, bêtir li hev dikin. Gorîstan, keskesora welatîyên curbecur e; lê zindî hev tehemul nakin. Em û mirî mirovê hev in. Ez her êvara îne serekî li wan dixim, roja erefê dibim mêvanê wan, sibeha eydê, berî herkesî ez diçim cejna wan pîroz dikim. Zindî tenê ne, mirî mervantir in.

Mirî çavên min in. Wan ji min xweşiktir didît. Ku hinek dibêjin "berhemên dîrokî" xweşiktî û lihevatiyê tê bîra min. Ne ji mizgeft, xan, medrese, bedesten û çeşmeyên wan ba min tahm ji nêrîna dîrokê nedistend. Em avahîyên mirîyan, nadin bi yê zindîyan. Firaqên berhemên dîrokî di cî de, avahîyên wan tebût, dirûvên wan bedew in. Ew bi xwe, bi pereyan nayên kirîn; lewra weke yê zindîyan ne ji bo pereyan hatine çêkirin.

Ez parêzgerê mirîyan im. Ez mafên mirîyan diparêzim. Mirîyên ku di paşerojê de neheqî kiribin, ez wan mehkûm dikim. Di dadgeh û meclîsan de ez dikim ku wekilên zindîyan li ser wan biryaran bidin. Heke neheqî



li wan bûbe ez rûmeta wan, bi regekî fermî didime wan. Heke ku wan neheqî kiribin, ez wan şermezar dikim û bi awayekî demokratîk wan mehkûm dikim. Ji bo ku zindî şad bibin, ez tola mirîyan ji hev distînim. Ji bo ku bêhna zindîyan fireh bibe, ez heyfa zindîyan, ji mirîyan distînim. Lewra hin jê di nav hev de xwînî bûne. Nevîçirkê hin mirîyan, zindî ne. Ez her çiqaşî parezgerê mirîyan bim jî zindî pereyan didin min. Ez dikarim tola mirîyan ji zindîyan bistînim; lê kesî ku pereyan bide nîne. Ji xwe em henekê xwe bi zindîyan dikin, ev heyf besî mirîyan e. Em aborîya xwe bi vî awayî dikin. Ku ne ji mirîyan be heyat ji me re nîne.

Ez serokê mirîyan im. Rehm û bereketa ku di wan de, di tu karî de nîne. Hingî zahf in, kî wan bide dûv xwe ti kes nikare zora wan bibe. Ez “Fatîhe” li ser wan dixwînim, “Yasîne” li wan dixwînim. Bi Qur’ana Pîroz şîreta li wan dikim. Ez Qur’anê fêm nakim, wê çawa ew fêm bikin! Deng nayê min wê çawa biçe wan? Ez pesnê xwe bi wan didim. Mirî cemeata min e. Em bi serê hev sûnd dixwin. Hingî çand û hunera mirîyan di nav me de zindî ye; ez carna difikirim, dibe ku ew pêşengê min bin. Lewra ez bi dûv wan de diçim. Di tengasîyekê de ez xwe davêjim wan. Ku zarok çênebin ez dehîyekê ser rihê wan şerjê dikim. Rihê wan bi me re dijî. Bi xêra wan rih tê me. Çanda li ser mirîyan, me zindî dike. Ew rêberê me ne; lewra di nav zindîyan de kesekî ku serokatîyê ji me re bike nîne. Bi xêra mirîyan, me fêm kir ku yên mirî em in!

Xêr li mirîyan dibe, zindî ji qencîyê fêm nakin. Ez xwarîna wan derdixim, şîva wan çêdikim, mewlûda wan didim. Zindî bi xêra mirîyan têr dixwin!

Ez hezkirê mirîyan im. Ez ji wan hez dikim ne ji xwe. Evînen mirîyan bêtir dibin mînak. Dengbêj û

qesîdebêj, şer û destanên wan distirên. Ku em helbestan dinivîsin, ji bo şibandina me bihêz be em hewceyî evînen mirîyan in. Çi di dilê min de be, ez li wan bar dikim. Çi tiştê ku ez nikarim bibêjim, dixim stûyê wan; lewra ew napeyivin. Evîna wan î mînak, ji min re formeke klasîk in. Bi xêra wan ez dibim xwedîyê berhemên edebî. Bi xêra wan ez dibim xwedî esalet.

Ez êsîrê mirîyan im. Hemû xwedîyên teorî û ekolan mirî ne. Hemû pêşengê da’weyên girîng di gorê de ne; lê hişmendîya wan di jîyana me de dijîn. Mictehîd mirî ne; em girtîyê şîroveyê wan in. Bergeha me li gorî berçavkên wan in. Tu kes ji tîrsa zindîyan, newêre rexneyekê li zanistên mirî bike. Nizane ew di gorê de ne.

Ez nexweşê mirîyan im. Birînen şerê paşerojê hê jî rehet nebûne. Kula me ku dîrok bi derewan hatîye nivîsandin, em êşa bêbextîya wan dikişînin. Keserên ku ji dilê me tên li ser mirîna wan e. Ew lehengê me ne, mînakên me ne. Ji bo kuştina wan em dikarin zincîran li xwe bixin. Êş û derdê ku wan kişandine dibin êş û derdên me jî. Jana li ser wan, wateyê dide jîyana me. Lê barê gorîstanê giran e. Min xwest ku ez bi hebên jibîrkirinê, bi derzîyê êşkûjê vî hişî pûç bikim. Lê ez dêhn bûm, min fêm kir ku berî dermanan ez ne nexweşbûm. Roja ku ez bê derd mam, ez mirim.

Zindî hevdu ditemirînin. Bi fîşek û teqînan şîyar nabin. Bombe hew bandorê li wan dikin. Çanda kuştinê, heqî kuşt; rastî vemirand. Tu kes nizane bê kî sax e, kî mirî ye. Zindî, di razana xapandinê de ne, di xewa bitirîyê de, xewna tiralîyê dibînin. Di mirêka jîyanê de herkes xwe nabîne; lê herkes xwe di gorê de dibîne.

Ez xwedîyê mirîyan im, xwedîyê da’wê; lê mixabin mirî min nasnakin !



# ÇEND BIWÊJ Û GOTINÊN PÊŞÎYAN ÊN AJMANÛKÊ\*

OMER BEXTÎYAR



*Ez vê xebatê dîyarî  
dê û bavê xwe dikim...*

---  
“Ew efendî, bes merivên  
bêguneh qetil nakin, her wiha  
dixwazin ku bîr û hafizeya me jî  
tune bikin. Ji ber vê divê em her  
tiştî qeyd bikin.”

---  
- John Berger -  
-



## DESTPÊK

Min biwêj, gotinên pêşîyan, meselok û nifirên ku ji dê û bavê xwe, ji mezin, rûspî û gundîyên xwe guhdarî kiribûn di sal û wextên cuda de qeyd kiribûn. Van gotin û meselokan gelek bala min dikişand. Nexasim jî piştî ku ez bi ziman re eleqedar bûm. Di nava sohbetekê de dema camêrekî an canikekê gotineke balkêş digot min hema yekser di telefona xwe de qeyd dikir û dûv re derbasî deftera xwe ya “Zimanê Kurdî” dikir. Lewre min zanibû ku ev biwêj, gotinên pêşîyan, meselok, nifir û çîrok xezîne ne û divê ku ev tiştane werin qeydkirin û bîr parastin.

Min di heşt salên dawî de (ji sala 2010an û vir ve) gelek biwêj, gotinên pêşîyan, meselok, nifir û çîrokên li gund û bajarê xwe berhev kirin. Hin ji wan hêj nehatine deşîfrekirin, hin ji wan jî di deftera de qeyd kirîne. Ez ê di vê xebatê de bes 27 heb biwêj û gotinên pêşîyan binivîsim û bi qasî fêmkirin û têgihîştina xwe wan rawe bikim. Helbet dibe ku hin kes derkevin û bêjin li cem me jî eynî biwêj û gotin hene. Ez ê bêjim ser çavan rast e. Jixwe ez ne di wê îdfayê de me ku ev biwêj û gotin bes aîdê gundê min Ajmanûkê ne. Nexêr tiştek wiha tune ye. Lê bes di van biwêj û gotinên pêşîyan de hin taybetî û xisûsiyetên devokî û vegotinê hene.

\* Ajmanûk gundekî bi ser navenda Mûşê ye



Wek nimûne, “hêj wê dewê dikelînin”, “hûn carekî daxê li destê xwe din”, “em berbanûkê davên çivîka” û “hema qiloch kirinin navranga me” dikarim bibêjim ku hema bes li wê herêmê tê gotin. Heta min ji hevalên xwe yên derdorê ku ji deverên cuda ên bakurê Kurdistanê ne jî pirsî, li cem wan tiştê wiha tune ye, lêbelê di heman maneyê de gotinên din hene. Helbet ev jî dewlemendî û zengîniya zimanê bav û kalan e. Herwiha min di vê xebatê de guhertinên pir piçûk kiribin jî lêbelê min dîsa hewl da ku wan nuansên devokî biparêzim.

### Biwêj û Gotinên Pêşîyan çi ne?

Biwêj û gotinên pêşîyan malê hemû civakê ne. Di zimanekî de çiqas biwêj, meselok û gotinên berê hebin ew ziman ewqasa dewlemend û xwedî rabirdûyek kevnare ye. Biwêj û gotinên pêşîyan li civata xwe şîretan dikin, rê nîşanî me didin û aqilan didin me. Dibin rêber û pêşengên me. Me bi fehm, feraset û hîkmeta xwe dibin dem û wextên berê û me dixin nav kûrahîya dîrokê. Em bi saya wan diçin demên qedîm, şert û mercên wê demê dibînin û wê atmosferê ditehmijin. Herwiha biwêj û gotinên pêşîyan ji ber ku bi zimanekî edebî, vekirî, kurt û wecîz in xeml û zînetê zimanê Kurdî ne. “Biwêj, dewlemendîya vegotinê bi hostatîya peyvên, bi awayekî bedewkar derdixin pêş. Ji pişt biwêjên zimanekî jîyana gel û çavdêrî û cerebeyên ku ji wê jîyanê darivî yên bi hezaran salan hene.”<sup>1</sup> Di biwêj û gotinên pêşîyan de hunerên wek şibandî û temsîlî hene. “Gelek biwêj bi şibandî û hûnera peyvê xemilîne ji bo derxistina holê ya vegotineke zindî û bedew.”<sup>2</sup>

1 - Mehmet Oncu, 101 Biwêj 101 Çîrok, Weşanên Avesta, Çapa Yekem, 2015, Stenbol, r.11.

2 - Mehmet Oncu, h.b, r.14

Hin taybetiyên biwêj û gotinên pêşîyan hene. “Dema ramanek ji xeta ferdîtiyê derbas bûyibe û civak gişt hembêz kiribe, ji pirsgerêkên wê civakê re çareserî anîbe, ji wê re cîhanbînîyeke hemdem û hêja pêşniyaz kiribe, berê wê civakê dabe qonaxeke bêhtir mirovane û tîjî bextiyarî, wê demê ew dibe malê civakê.”<sup>3</sup> Herwiha biwêj û gotinên pêşîyan Kurdayetîyê nîşan dide û bi pêş ve dibe. “Gotinên pêşîyan netewî ne, edet û marîfetên gel, hestên Kurdayetîyê nîşan didin. Kal û pîrên me bûyer û tofan û xafilqeda û bobelatên serê wan de hatine, ders jê derxistine. Bona em ji wan îbretan bigrin, wek temî û şîretan li me kirine.”<sup>4</sup>

Biwêj û gotinên pêşîyan ziman xweş dike, şêrîn dike, dixemilîne û kirasek delal lê dike. Dema mirov, merivên rûspî û zana guhdarî dike feyz û tahm jê digire. Lewre zimanê wan fesîh e, herikbar e û tê de heta tu bêjî biwêj, gotinên berê û meselok hene. Divê em xwedî li vê xezîneya xwe derkevin. Wan berhev bikin û wan ji wendabûnê xilas bikin. Dûv re jî heta ji destê me hat em wan berhemên berhevkerî biweşînin bila bibe dokument û belge. Herwiha ew ê bibin malê edebiyata Kurdî ya nivîskî jî. Xebatên bi vî rengî zor girîng in lewre lazim e nîşên dahatû ji vê keleşorê, ji vê bîr û hafizeya devkî û dîrokî bêpar nemînin û gilî gazincên xwe ji me nekin.

### Kurtedîroka Gundê Ajmanûkê

Niha dixwazim hinek behsa gundê xwe yê bi nav û deng bikim. Wek Ajmanûkiyekî divê ez di serî de bibêjim ku Ajmanûk, “başkenta” (payîtexta) Mûşê ye. Hûn dixwazim ji Mûşîyan bipirsim ka payîtexta Mûşê

3 - Abdulkadir Bingöl, Gotinên Pêşîyan û Biwêj, Weşanên Na, Çapa Duyem, Gulan 2014, İzmîr, r.6.

4 - Şêxmûs Aslan, Ferhenga Gotinên Pêşîyan, Weşanên Sözü Gazetecilik Yayın, Çapa Yekem, Zivistan, 2006, Amed, r.5.



ku ye, wê bersiwa we bidin... Û em îja dest bi meseleyên teknîk bikin. Ajmanûk gundekî bi ser navenda Mûşê ya bakurê Kurdistanê ye. Mûş yek ji bajarên Serheda rengîn e. Warê dengbêj û dengxweşan e. Ajmanûk jî gundekî şêrîn yê vî bajarî ye. Gund, pênc kîlometro ji navenda Mûşê dûr e. Li alîye wê yê rastê; gundê Çirîşê ( bi tirkî: Bağlar), ji hêla çepê jî gundê Kasorê (bi tirkî: Suvaran) hene. Li hemberê gund jî gundên Qijlakom (bi tirkî: Kumluca) û Mixakomê (bi tirkî: Çatbaşı) hene. Erê ez dibêjim gund lê mixabin vê talîyê li gund di 23yê Tebaxa 2017an de referandûmeke çêbû (çiqaş demokratik e ne wisa?) û bi piraniya rayên gundîyan ji statûya “gundîfî”yê derket bû taxeke girêdayî ser navenda Mûşê. Sed heyf, heyfa min tê li wê heyfê... Yanê tabî dîsa Ajmanûk ji payîtextîya xwe nakeve, helel nayê jê, hema çi zanim em wek gund “xweserbûna” çêtir bû. Lewre payîtextî tiştêkî muhîm e û nabe para her cihê.

Welhasilê kelim, li gorî rîwayetan navê gundê me jî “Manûk”ê Ermen (Kurmançên me jî bo Ermenan “Fille” dibêjin) tê. Berê li gund du malbatên Ermen hebûne. Piştî “qirkirinê” (jenosîdê) ew Ermen hatine “tehcîrkirin.” Li gund haya tu kesî niha jî wan malbatên Ermenan tune ye. Di salên derdora 1650-1700î wan de, li gund bi navê Manûk, Ermenîyekî aşvan hebûye. Mala Manûk li Newala Qeşayê, li quntara çiyê bûye. Li gorî gotina mezinan, ji ber aşê Manûk, ji gund re gotine “Aşê Manûk” dîv re di nav dem û wextê de “Aşê Manûk” guherîye û bûye Ajmanûk<sup>5</sup>. Hin kes jî dibêjin navê gund jî Manûk tê lê bi vî awayî: Manûk diçe ku derê an jî kî tê aşê wî, ew ji wan re dibêje, “Ez”. Piştî mirina Manûk navê gund dimîne Ezmanûk, pişt re jî diguhere dibe Ejmanûk. Li gorî min rîwayeta ewil bêhtir sehîh û durist e. Lê tiştêkî wiha jî heye ku gundî navê gund wek “Ejmanûk” bi lêv dikin, lê gundîyên derdorê û Mûşî dibêjin Ajmanûk, carinan jî dibêjin Acmanûk. Ev jî bila li vir qeydkirî bimîne.

Li gund li Newala Qeşayê du malbatên Ermenan û li Taxa Koxa jî Mala Bazo û Mala Hemo hebûne. Di serê salên 1700î wan de, kalikê me Uzeyîrê Zilfeqa<sup>6</sup> ji Terêşa Batmanê dibe mihacir û tê vî gundî. Berê bi gayan mihacirî dikirin. Gayê Uzeyîrê Zilfeqa diweste û hema konê xwe li kanîya gund datîne. Êdî gund li derdora kanîyê ava dibe. Di nav eşîra Bekiran de navkirinên wek “Gawesta” û “Gamirî” hene. Ji malbata me re jî dibêjin Mala Gawestîyan ya jî Re'ya<sup>7</sup>ê Gawestîyan.

5 - Index-Anatolicusa Sevan Nişanyan de navê gund Kurdî wek Acmanuk, Ermenîkî jî wek Açmanug hatiye destnîşan kirin. Binêre: [http://nisanyanmap.com/?y=&t=&ua=0&u=1&ll=\(38.77351402325635,%2041.44058577886062\)&z=15&mt=roadmap](http://nisanyanmap.com/?y=&t=&ua=0&u=1&ll=(38.77351402325635,%2041.44058577886062)&z=15&mt=roadmap) (05.03.2018)

6 - Uzeyîr kalikê min ê 7an e. Şecereya me wiha ye: Ez Omerê Teyfîq, Teyfîqê Sidîq, Sidîqê Bedo, Bedoyê Mûsa, Mûsayê Omer, Omerê Resûl, Resûlê Uzeyîr, Uzeyîrê Zilfeqa, Zilfeqayê Mihemed.

## Şewitandina Gund

Herwiha gund, di payîza sala 1993an de hate şewitandin. Taxên Jor û Koxa yên gund şewitîn, gelek malbat şerpeze bûn, malmîrat bûn. Yanê Ajmanûk jî yek ji wan gund û warên şewitandî û talankirî yên Kurdistanê ye.

De, bav û kalan ji mêj ve gotine, “welat welatê Kurda ye, milletê Kurd tê de winda ye.” Dîsa ji bo vê rewşa malmîrat û malxirab, ên berê gotine (hezar rehmet li gor û kefenê wan be), “gundê bê serî, şivanê bê kerî.” Yanê heta ku em wiha bê serî û sermîyan bin, bi qewlê Seydayê Xanî; heta “padîşahek” me tunebe ku “layiq bidîya Xwedê kulahek”, wê tim û tim li me “xalib werin ew Rom û Erebe û Ecem” û dîsa em ê bibin “xerabeyê di destê bûm...”

## Eşîret û Qewmên Li Gund

Piraniya gundîyan Elmanî ne ku ew ji bavekî yê ji eşîra Bekiran (Bekirî) in. Gerçî Apê Mûsa “Anter” di bîranînên xwe de behsa eşîreta Elmanî dike û dibêje dibe ku têkilîyeke di navbera eşîra Elmanîyan û wek netew Elmanan de hebe. Heta dibêje Kurd û Elman xal û xwarziyê hev in û têkilîya di navbera navên Elmanî û Elmanan nişan dide. Lê heta niha tu Elmanek (wek netew yanê) nehatin têkilîyek bi me re danenin û negotin yaw em xal û xwarziyên hev in... Welhasil, em di ku de mabûn, ha me behsa eşîr û famîlyayên li gund dikin. Li gel eşîra Elmanan di gund de ku bi eslê xwe ji eşîra Xîyan<sup>7</sup> e jî hene. Xî jî ji alîyê Dîyarbekirê hatine gund, qîz xwestine û êdî li gund mane. Berê malek tenê bûn û ji wan re Mala Emer digotin. Mixtarê gund Hecî Keremê Ehmedê Mistê ye û ji eşîra Xîyan e.

## Gund ji van qewmên jêrîn pêk tê:

Piraniya gundîyan ji qewmên Re'ya û Mala Bazon in.

**Re'ya:** Ji wan re Mala Gawestîyan ya jî Re'ya<sup>7</sup>ê Gawestîyan tê gotin. Di nav xwe de jî çend bav in. Wek Mala Kito, Mala Şero û Mala Heyran. Ji famîlyeya me re Mala Kito (Kito pîrika kalikê min e û navê wê jî Kitanê ye. Tê texmînkirin ku salên di navbera 1864-1930an de jîyaye) dibêjin. Piraniya paşnavên Re'ya Sönmez in.

**Mala Bazo:** Ji wan re Mala Bazo ya jî Qewmê Bazo tê gotin. Ew jî di nav xwe de çend bav in. Wek bavên Xişo, Cindo, Mala Heyder, Mala Feto û Mala Silêmanê Selîm. Paşnavên wan wiha ne: Karakaya, Tek, Konuksever, Kantaş, Karataş, Seyhan û Soykan.

**Mimkî:** Ev qewm ji Mala Mirad û ji Mala Cîho pêk tê. Paşnavên wan Aktaş in.

7 - Ji bo bêhtir agahîyan binere: <http://www.sasun.org/tarih-kosesi/xiya-asireti-ve-xiyan-bolgesi-h464.html> (05.03.2018)

**Xelevka:** Xelevka ji alîye Dîyarbekirê bi melatî hatine di gund de bi cih bûne. Ji wan re Mala Hiseynê Mele jî dibêjin. Paşnavên wan Ardil, Armut û Cemiloğlu ne.

**Misûrka:** Ji malên Hecî Ferman û Mala Îbo pêk tê. Paşnavên wan Uslu û Dönmez in.

**Gund ji şeş taxan pêk tê:** Taxa Jêr, Taxa Jor, Koxa, Kirsax, Mer'ana û Mala Mirad. Gund 500 malî zêdetir e û kampusa Zanîngeha Mûş Alparlanê li gund di navbera Kasor û Ajmanûkê de ye.

Piştî çend agahî û îzahetan em niha çend biwêj û gotinên pêşîyan ên Ajmanûkê ji we re rave bikin. De kerem bikin...

## **BIWÊJ Û GOTINÊN PÊŞÎYAN**

### **1-Mirin rûsipîtiya mirovan e.**

Yanê mirin xilasîya însanan e. Herwiha dibêjin xwelî yanê ax, mirovan paqij dike. Extîyareke dema di nav dest û pîyan de be ji yê derdora xwe re dibêje, "Ez bimirim ez ê rûspî bibim." Ji bo kesên ku di nav destûpîyan de ne dibêjin; "Mirin jê ra zêrîn e." Li alîye Farqînê jî dibêjin, "Mirin paqijîtiya însanan e."

### **2-Nan hemû nan e, lê bihar e dîn û îman e.**

Di vir de xweşikî û qelîteya nanê bihare tê gotin. Pekî, nanê bihare çi ye? Tovê (genim) ku di biharê de tê avêtin re bihare tê gotin. Tehma wê xweş e û herwiha ji bo nexweşîyan jî baş e. Cureyên nanî ev in; Nanê payîze jê re nanê kose jî tê gotin, nanê ceh, nanê garis û nanê gilgilê<sup>8</sup>. Zemanê berê dewlemendan nanê garis, feqîran jî nanê gilgil dixwarin.

Genimê bihare tu dikarî payîzê tov bikî, lê tu nikarî payîze di mehên biharê de tov bikî, heke were tovkirin jî bihustik radibe û disekine.

### **3-Şîn û şayî (şahî) bi du-sê heban nabe.**

Yanê di rojên xweş û nexweş de lazim e xizim, eqreba, nas û gundîyên mirov li bal mirov bin. Ên berê dibêjin lazim e ku meriv di şîn û şahîyên merivên xwe de hebe. Li gorî gotina bavê min, "şîn û şayî bi merivek tenê nabe, heke bibe jî wekî dara fêkîyê ye ku nagire." Li hin deveran jî dibêjin, "şîn û şahî bi xweyîya ne".

### **4-Hesp dixebite lê ker dixwe.**

Mesela di malekî de birayekî bixîret bixebite, lê birayekî din ê bexîret nexibete wê demê dibêjin, "Welle hesp dixebite lê ker dixwe." Li hin cihan berevajî wê dibêjin, "Ker dixebite, lê hesp dixwe."

8 - Li Ajmanûka Mûşê ji sivnikên serî bi haşhaş re "gilgil" dibêjin. Gilgilên reş û spî hene.

### **5-Devê hirçê nagire sêvê, divê tahl e.**

Yanê tiştê ku ji destê însanan nayê ji xwe re hincet û bihane dibîne û dibêje, "Yaw jixwe ev tişt ji min re nedibû." Canik û camêrek jî li ser vê gotinê jê re dibêje, "Devê hirçê nagire sêvê, divê tahl e." Li hin herêman jî dibêjin, "Devê rovî nagihîje tirî, dibêje bila xêra dê û bavê min be."

### **6-Zivistan; ar û rûn û şekir e.**

Li gundan dema di zivistanê de ar û rûn û şekirê meriv hebe ew zivistan xweş derbas dibe. Li gundê Belawelaya Farqînê jî, li gorî gotina Xatîya Fatimê dewama vê gotinê wiha ye; "Hevîrê xwe bike, tor û bextê xwe mêzeke, ku ber û baran bê, tu yê nanê xwe lê bikî." Herwiha di zivistanê de ji ar û rûn û şekir helawek xweş jî çêdibe.

### **7-Dil kerê de diranê wî tune dahş (cehş) e.**

Ji bo ew kesên ku hay ji rewşa xwe nîn in re dibêjin, "Dil kerê de diranê wî tune dahş e."

### **8-Zilm zû pozê meriv dişkêne.**

Dîsa bav û kalan gotine, "Ayîka me wê di pozê wan de derkeve", "Ayîk namîne." Li gorî hedîsa Hz. Pêxember (e.s); "Kifir dewam dike lê zilm dewam nake." Yanê dawîya her zilimkarî xirab û xedar e. Ax, ayîk û aha mezlûm, mexdûr û bindestan li erdê namîne, dê helbet rojekî di pozê wan de derkeve.

### **9-Ewr ewrê me ye, lê şilî şilîya xelkê ye.**

Yanê mal û milk û dewlemendî ya me ye, lê dagirker û talankar tîn li serê rûdinên, dest dideynin ser mal û milkên me. Herwiha ew tiştên ku aîdê mirov in lê bexêr in re jî dibêjin "Kûçik kûçikê me ye, lê li ber deriyê xelkê diwêtê." Yanê bi kêrî xwedîyê xwe nayê lê ji xelkê re jêhatîye. Wek gotina, "Ji xelkê re masîgir e, lê ji xwe re kûsîgir e."

### **10-Ê me jî em naxwazin dû ji kuleka me bikşe (bikişe).**

Yanê em hevûdin hez nakin û xêra hev naxwazin. Ji bo hesûdîya însanan tê gotin. Lewre dema di kuleka merivan de dû bikişe tê wê maneyê ku nan û xwarin tê çêkirin, bereket û dewlemendî di wê malê de heye.

### **11- Hema qiloç kirine navranga me.**

Yanê serî dane ser me, dev ji me bernadin. Vê gotinê ji ber vê bûyerê girtine û şibandine vê meselê; salên berê gamêş diçûn garanê, heywanek feqîr li kuderê heba misêwa qiloçê wî di navranga wî / wê de bû." Dema yekî serdest û bihêz, zilm û neheqî li yekî feqîr dike êdî sebr û tehemula merivê feqîr namîne û jê re dibêje, "Law bes e hema te qiloç kirîye navranga me." Ev gotina serî rakirina li hember zilm û neheqîyan e.



**12- Hê(j) jî wê dewê dikelînin (dikewînin).**

Di heman maneyê de dîsa dibêjin, “Kayê kevn dide bayê.” Dema camêrek bûyer û qewimînek berê di roja îroyîn de dibêje jê re tê gotin, “Hêj jî wê dewê dikelînin” yanê tu hêj li ser wê hiş û mêjîyê berê yî. Dîsa dibêjin, “ew bav mir.” Wek gotina, “Hêj jî li ser wê guhê ye.”

Di heman maneyê de li Qoserê dibêjin, “Hin bi kîrê berê dimîzin”, li Silîva jî dibêjin, “Hin bi kîrê berê mîz dike.”

**13- Hûn carekî daxê li destê xwe din.**

Dema xwedîyên pez digihîjin hev û bi hev re sivanek digrin êdî dibin “colî”yê hev. Colî ji bo ku pez û heywanên wan ji hev were derxistin pezên xwe dexme (dax) dikin. Dax û dexme elametê naskirin û îşaretê ye. Ev gotin ji bo ew kesên ku kêmasî, qîsûr û eybên xwe nabînin re tê gotin. Mêrik qet behsa kêmasîyên xwe nake û hema tim ji xelkê xeber dide, wê demê yek radibe û jê re dibêje, “Tu carekî jî daxê li destê xwe ke.” Herwiha dîsa li cem me dibêjin “Dexma meriv li meriv naxuye, lê ya hevalê meriv li meriv dixuye.” Di heman maneyê de dibêjin, “Kes nabê dewê min tirş e.”

**14-Dawet nanê bi deyn e.**

Yanê îro dora min e, sibê jî dora te ye. Yanê dawet jî wek nanê bi deyn e. Dîsa dibêjin, “Mirov here daweta xelkê, wê xelk jî were ya mirov.”

**15-Sifra xwînê jin radikin.**

Dema mêrkuştin (xwîndarî) di navbera du malbatan de diqewime, alim û rûspî dikevin navberê ku wan li hev bînin. Lê mixabin pîrî caran hin kes naxwazin ku silh û aşîtî çêbibe û pê li vê karê dikin. Wê demê ew jina ku bav, bira, kur an jî mêrê wê hatîye kuştin tê nava cemaetê û dibêje, “Min xwîna kurê xwe berê erdê da, bila silh çêbe.” Li hin deveran jinê laçika (şelbe) xwe li hafa mêran diavêtin erdê. Ji ber ku qedrê jinê nedihat şikandin jî her du alî li hev dihatin. Ji ber vê hindê gotine “Sifra xwînê jin radikin.” Yanê sifra xwînê mêr datînin, lê jin radikin.

**16-Em berbanûkê davên (diavêjin) çivîka.**

Yanê ev kar naçe serî, hemû hewl û xîreta me dê bêencam bimîne. Karê ku em dikin wek karê zarokan e ku, “Berbanûkê<sup>9</sup> davêjin çivîka.” Bi gotina Mûşîyan ev kareke beredayî ye.

**17-Çima gelo kerê xelkê ji we ra hesp dixuye.**

Wek gotina, “Gîyayê hewşê tahl e.” Bavê min gotineke wiha jî digot, “Ê meriv ji meriv ra xweş naxuye, lê ê xelkê ji meriv re şêrîn û xweştir dixuye.”

9 - Li hin herêman ji bo berbanûkê dibêjin; çeqel, çeqelîk, çeft-elastîk û çetelastîk.

**18-Ava çi gû bû, me bi rêxa xwe da.**

Ji bo karên tewşomewşo tê gotin. Camêr karekî dike û dilewitîne dûv re dibêje, “Ava çi gû bû, me bi rêxa xwe da.”

Wek gotina, “Wa me çi kir, me çi kir, me xwelî li serê xwe kir.” Li Farqînê jî dibêjin, “mişk çi dike xwelîyê li serê xwe dike.”

**19-Ker li ba hev hînî tir û fisê hev dibin.**

Wek gotina, “Tu bi kê re rûnî tu yê kurmê wî hilînî.”

**20-Xwedê meriv nexê gêla xiraban.**

Yanê Xwedê, meriv neke mihtacê namerd û xiraban. Gêl û tor û de'wa xiraban pîs e, qirêj e. Li Qoserê jî ev gotin wek, “Xwedê meriv nexê tora xiraban” tê gotin.

**21-Heya nigê (ling) xwe deyne erdê, bila deyne ser serê min.**

Ji bo mirovên qenc û baş tê gotin. Ev gotin ji bo qedirbilindîyê ye. Di cemaetekî de behsa merivekî baş tê kirin, camêrek jî dibêje, “ ew heya nigê xwe deyne erdê, bila deyne ser serê min.”

**22- Lêva jêr li jor naxe.**

Ji bo kesên ku xeyidîye yan jî pir xemgîn bûye û bi kesî re mijûl nabe re tê gotin.

Li Qoser û Erxenîyê jî di heman maneyê de dibêjin, “Çavê rastê, çavê çepê nabîne.”

**23-Xêra çavê rastê ji ya çepê ra tune ye.**

Yanê kar û peywira her tiştî heye. Carinan wiha jî dibêjin, “Xêra destê rastê ji ya çepê re tune ye”, “Êdî xêra bira ji bira re tune ye” yanê herkes bi ser û sermîyanê xwe ye.

**24-Dermanê mirinê ye, tu bigerî mûkî (mûyekî) tê da nabîni.**

Yanê pir xweşik û bedew e, bêqisûr e tu bigerî mûyekî jî tê de nabîni.

**25-Qey ez ji we ra qûna pîvazê spî bikim.**

Hinek mesele hene ku mirov li bal herkesî bi eşkereyî nikare bibêje. Bes meriv derheqê wê meseleyê de hin tiştan dibêje û yê li hemberî xwe re dibêje, “qey ez ji te ra qûna pîvazê spî bikim” yanê fêm bike ez dibêjim çi. Dîsa dibêjin, “Qey hema ez ji te ra pîvazê spî bikim û bidim destê te.” Te dî dema mirov pîvazê spî dike, qalîkê serê radibe û qûna pîvazê derdikeve ortê.

Li Qoserê jî wiha tê gotin, “Ma em ji te re bi ta û derzîyê vekin.”


**26-Divên (dibêjin) neyartî û bêbextî naçin ber hev.**

Yanê neyarê meriv be jî divê mirov jê re bêbextî neke. Berê dema li gundan xwîndarî çêdibû malbata ku mêr kuştibe mal û eraziyên xwe gund de dihêştin û terka gund dikirin. Neyarc ku bêbext bûya agir bera xanî û milkê neyarên xwe didan. Ji bo vê rûreşiyê mezin û rûspî digotin, "Neyartî û bêbextî naçin ber hev", herwiha digotin, "talan û mal şewitandin ne karê mêra ye."

**27-Derî dikeve, kexxîç dirabe (radibe).**

Yanê dema wextê derî derbas dibe yanê dirize êdî kexxîç radibe û dikeve dewsa derî. Ev gotin ji bo însanên dinyanedîtî jî tê gotin. Camêr berê feqîr bûye dîv re bûye zengînek dinyanedîtî, xwe fehşomehşo dike wê demê jê re dibêjin, "Derî dikeve, kexxîç<sup>10</sup> dirabe." Wek gotina, "Şêr di xew de be, berx qral e."

<sup>10</sup> - Kexxîç: Berê bi çepelan çêdikirin û didan ber deriyê berxikan.



**Nîşe:** Wêneyên vê xebatê ji arşîva Adem Sönmez hatine girtin.

**Jêder**

- Maşallahê Sidîqê Bedo, 63 salî, xwende, ji gundê Ajmanûkê ye.
- Teyfîqê Sidîq, 58 salî, dibistana seretayî qedandîye, ji gundê Ajmanûkê ye.
- Remzîye Sönmez, 53 salî, nexwende, ji gundê Ajmanûkê ye.
- Adnan Sönmez, 34 salî, Lîse qedandîye, ji gundê Ajmanûkê ye.
- Cegerax, 34 salî, Lîsansa Bilind, ji Qosera Mêrdînê ye.
- Hecî Mihemed Nezîr Eker, 65 salî, dibistana seretayî, ji gundê Belawela ya Farqînê ye.
- Hecî Fatma Eker, 60 salî, dibistana seretayî, ji gundê Belawela ya Farqînê ye.
- Îbrahîm Îpek, 42 salî, Zanîngeh qedandîye, ji Erxenîya Dîyarbekirê ye.

**Çavkanî**

- Abdulkadir Bingöl, Gotinên Pêşîyan û Biwêj, Weşanên Na, Çapa Duyem, Gulan 2014, Îzmîr.
- Mehmet Oncu, 101 Biwêj 101 Çîrok, Weşanên Avesta, Çapa Yekem, 2015, Stenbol.
- Şêxmûs Aslan, Ferhenga Gotinên Pêşîyan, Weşanên Söz Gazetecilik Yayın, Çapa Yekem, Zivistan, 2006, Amed.
- [http://nisanyanmap.com/?y=&t=&u a= 0&u=1&ll= \(38.7731641 18445735, %2041.43870511915361\)&z=14&mt=roadmap \(05.03.2018\)](http://nisanyanmap.com/?y=&t=&u a= 0&u=1&ll= (38.7731641 18445735, %2041.43870511915361)&z=14&mt=roadmap (05.03.2018))
- [http://www.bekirandernegi.com/index.php?option= com\\_content&task=view&id=33&Itemid=39 \(05.03.2018\)](http://www.bekirandernegi.com/index.php?option= com_content&task=view&id=33&Itemid=39 (05.03.2018))
- [http://www.sasun.org/tarih-kosesi/xiya-asireti-ve-xiyan -bol-gesi-h464.html \(05.03.2018\)](http://www.sasun.org/tarih-kosesi/xiya-asireti-ve-xiyan -bol-gesi-h464.html (05.03.2018))
- Ji bo koçerî û dawetên Ajmanûkê binêre: [https://www.youtube.com/watch?v=540oDMoU5hQ \(05.03.2018\)](https://www.youtube.com/watch?v=540oDMoU5hQ (05.03.2018)), [https://www.youtube.com/watch?v=3oh1x9BAsMA \(05.03.2018\)](https://www.youtube.com/watch?v=3oh1x9BAsMA (05.03.2018))
- Ji bo danasîna gund binêre: [https://www.youtube.com/watch?v=NBYNCCIZqLc \(05.03.2018\)](https://www.youtube.com/watch?v=NBYNCCIZqLc (05.03.2018))



# MESELEYA RÊ

EYLEM AKINCI



Pirpirîka Rengîn çû cem balçimkan behsa rewşa kulîlkan û kûsîyan ji wan re kir.

Balçimkan got hevalê pirpirîk, tu jî dizanî ku derketina me ya derve tenê bi şev e, bila tarî bikeve em ê werin. Pirpirîkê jî got ku, de baş e û firîya çû cem hemcinsên xwe, tiştên hatibûn serê kulîlkan û bandorê li wan bike yek bi yek ji hevalên xwe re got, koma wê jî heq dan û li serê fikirîn. Pirpirîkan êdî biryara xwe dabûn ji bo bibe şev, ber bi tavê ve firîyan...



Kûsîyan, weke her rojê, wê sibe jî, ji hundir derketin derve û berê xwe dan hêla erdê kulîlkan. Di wargeha kulîlkan de dîtî û gotin nabe wek hev. Ew der bi rengê biharê, bi ava zozanan, bi dengê çivîkan xemilandîbû û bêhna pinçar û kulîlkan jê dihat.

Kûsî, nêzîkî erdê bûn û teşqelayek ket nav kulîlkan, her yekê ji wan gazî ya din dikir û digotin: "Lawo lawo, keçê keçê birevin, hatin hatin dîsa hatinnnn!"

Ev teşqela kulîlkan, her roj wisan bû. Di nav kulîlkan de kulîlkeke sermîyan hebû, navê wê Pîra Beybûn bû. Pîra Beybûn lê nihêrî ev halê wan gelek xireb e, serên xwe xist ber xwe û fikirî û bi xemgîni serê xwe rekir û got:

-Ey gelê kulîlkan, ez ji ku derê dest pê bikim, nizanîm, lê wisan dewam bikeeee... Mixabin, ev ê wisan here, em êdî tu kesî nabînin li ser rûyê erdê, em ê giş di bin kûsîyan de biherisin.

Gula Belengaz:

-Êêê Pîra Beybûn, ka em ê çi bikin qey qedera me ye, qey siûda

me ev e, ev kûsîyên hanê restî me hatin, wey li min ê wey li me yê!

Nefel:

-Hevalno, welle weke Pîra Beybûnê jî got em ber bi qedandinê ve diçin, lê xebereke min heye, ez ê ji we re bibêjim hela hûn dibêjin çi?

Kulîlkan giş bi hev re dest pê kir, gotin:

- De bibêje hevalê.

Nefel:

- Ez ê di xeberdana xwe de ji we re qala tiştên min ji mozan bihîstîye bikim, ew ê baştir bibe. Ev du roj in, ez li mozan guhdar dikim û moz ji min re tiştên ecêb dibêjin.

Kulîlkan got:

-Hela hela çi ne gelo?

Nefel:

-Hela hinekî bisekinin, ez peyva xwe biqedînim. Ez di ku de ma-bûm, himmm tamam mozan ji hev re digotin: "Li filan çiyayî şikeftê heye, di şikeftê de çend sendelî hene û li ser sendelîyan jî, çend balçimk hene."



Gula Belengaz:

-Wey balçimk îcar çi bû, ev çi navekî tewşo mewşo ye!

Nefel:

- Lê min jî wek te digot gelo balçimk çi ye? Lê mozan ji hev re digotin: "Balçimk nola çivîkan e, hema ew bi şev tenê derdikevin derve, ji ber ku bi roj pirtûkan dixwinin, der û dore xwe hînî xwendinê dikin, di dadgehane de dew û dozan çareser dikin, heqî û neheqîyê ji hev vediqetînin."

Ez bawerim hûn tégihîştin, hûn serxwet bûn?

Pîra Beybûn:

-Cana min, me ji te fehm kir, lê ka em ê çawa herin şikeftê, hadê em çûn em ê kûsîyan çawa bibin?

Gula Belengaz:

-De ka Pîra Beybûn, bi roj ba, me yê bi rengê xwe û bêhna xwe balçimkan bianîya, de ka em çi bikin qey şansê me bû, ew bi şev derdikevin derve.

Kûlîlkan ji serê sibehê ve qirika xwe qelaştin lê tu çareserîyek nedîtin û gişt di cihên xwe de betilîn. Lê wexta ev kulîlk dipeyivîn Pirpirîka Rengîn jî guhdarîya wan dikir.

Pirpirîka Rengîn:

-Hevalên kulîlk, bibexşînin min guhdarîya we kir, ez pir xemgîn bûm, him ji bo pergala we, him jî ji bo pergala me. Ji ber ku qetilkirina we qetilkirina me bi xwe ye. Lê min

çareyek dîtîye, hûn gişt kom bibin ez ê niha mizgînîya xêrê ji we re bînim.

Pirpirîka Rengîn çû cem balçimkan behsa rewşa kulîlk û kûsîyan ji wan re kir.

Balçimkan got hevalê pirpirîk, tu jî dizanî ku derketina me ya derve tenê bi şev e, bila tarî bikeve em ê werin. Pirpirîkê jî got, de baş e û firîya çû cem hemcinsên xwe, tiştên hatibûn serê kulîlkan ji wan re bibeje da ku bandorê li wan bike, koma wê jî heq dan wê û li serê fikirîn. Pirpirîkan êdî biryara xwe dabûn ji bo bibe şev, ber bi tavê ve firîyan...

Êdî bûbû tarî, balçimkan jî ji hevûdu re gotin, va bû şev hadê em soza xwe bînin cîh û ber bi warê kulîlkan ve firîyan û hatin di nav kulîlkan de rewestîyan û gazî kûsîyan kirin û dadgeh danîn. Di dadgehê de pêşî kulîlkan dest bi axaftinê kirin. Pergal û rewşên xwe yek bi yek gotin. Dûv re jî kûsîyan dest bi axaftinê kirin û gotin:

-Kulîlkên hêja, hûn evqas di ber me de bimirûz û xembar bûbûn lê mixabin tiştê ji destê me bê tune ye, em mecbûr in di vî warî re derbas bibin.

Yek ji kulîlkan yek ji kûsîyan ketin qirika hev û ji balçimkan Balçim Deqê îcar dest bi axaftinê kir:

-Hevalno, welleh ez pir êşîyam bi vê teşqeleya we, hela li min binêrin.

Hemû kulîlk û kûsî berê xwe dan Balçim Deqê. Balçim Deqê berê xwe da wan û dest bi axaftina xwe kir:

-Hevalno, em hemû hatine jîyanê lazim e em vê jîyanê bi hev re xweş derbas bikin. Ji ber ku em li vê jîyanê mêvan in û em îro hene lê sibê tune ne. De werin em gişt bibin dost û hevalên hev û vê acizîyê bi zimanekî xweş bi hev bidin fêhmkirin û serwext bibin, da ku ev mesele wê çawa hal bibe bibînin? Bawerîya min ew e ku çareserîya vê meseleya tiştêkî zaf hêsan e.

Kulîlk û kûsîyan bi hev re gotin: "Heyra qurban ji ku hêsan e?"

Balçim Deqê:

-Hêsan e ji ber ku meseleya we, tenê pirsgirêka tunebûna rê ye.

Kulîlk û kûsîyan gotin, "wey li me yoo, ev çend sal in ev acizîya me ji ber tunebûna rêyê ye!"

Balçim Deqê:

-Belê ji bo rêyekê bû. Lê ev meseleya rê, em ê hemû mil bidin hevûdu û çareser bikin. Welhasil em ê bi şev, hûnê jî bi roj bixebitin û em ê rê çêkin û vê meseleyê çareser bikin.

Balçimk firîyan çûn hêlîna xwe, pirpirîk jî ji ber tavê hatin xwarê; êdî bi roj pirpirîk, kulîlk û kûsî; bi şev jî balçimk ji bo çêkirina rê xebitîn. Bi qedandina rê re war û erdê kulîlkan bû cihê şad û seyranê, meseleya rê çareser bû û gişt bi hev re şad bûn...



# HECÎ Û ÖMÜR

## REMZÎ REŞANÎ



Law kurê min çiqas ker e. Îja “Ömür” çi ye? Ez ji bona navê xwe bikim “Hecî”, min çend milyar pere da û ez çûm Hecê, Mala Xwedê. Kurê min ê bêaqil jî rabûye navê xwe yê Hecî ji bo biguherîne û bike Ömür, çûye mehkemê! Axxx axxx...

Em do li mala xalê min Hecî Evdila bûn.

Min rewşa xalê xwe pirsî û me hinek jî derheqê tiştên din de xeber da.

Em nêzikê nîv saetî rûniştin; me çaya xwe vexwar, mêwe xwar û hin mesele nirxandin.

Derî vebû û kurê xalê min yê herî piçûk hat.

Emrê wî di dora 19-20 salî de ye. Ket hundir û silav da.

Ji wî re jî çay anîn.

Navê kurê xalê min Hecî ye.

Rewşa me pirsî û di vê navberê de ji min re got:

- Remzî abê tu zanî, ez çûm mehkemeyê min navê xwe guherand.

Min jê pirsî:

- Te navê xwe kirîye çi law?



Ez jî difikirîm, dibêjim niha Hecî navek Kurdî û zindî li xwe kirîye.

Hecî got:

- Min navê xwe kir “Ömür”...

Ez matmayî mam. Min lê mêze kir û got:

- Te got çiiiiii???

Got:

- Ömür, Ömür... (bû hîke hîka wî û dikenîya)

Min got:

- Ev çi ye Heco, ev çi nav e? Te navekî xweş li xwe bikira wîî!

Xalê min Evdila bihêrs ket navê û got:

-Kurê min, lawê min ev çi nav e, ev çi tiştê beredayî ye. Te navek Kurdî an jî dînî li xwe kiriba, kurê min?

Hecî/Heco/Ömür bersiv da:

- Bavo, ev nav niha moda ye, ma tu nizanî.

Qet fedî nekir û paşê dîsa kenîya.

Xalê min Hecî Evdila hinek hêrs bû û kurê xwe him ji aliyê navê Kurdî û him jî ji aliyê navê dînî ve rexne kir.

Xalê min got:

- Law kurê min çiqas ker e. Îja “Ömür” çi ye? Ez ji bona navê xwe bikim “Hecî”, min çend milyar pere da û ez çûm Hecê, Mala Xwedê. Kurê min ê bêaqil jî rabûye navê xwe yê Hecî ji bo biguherîne û bike Ömür, çûye mehkemê! Axxx axxx...

Çîroka Hecî û “Ömür” bi vê rengî bû.

# ŞÎRÊ MITIRBAN

■ ARAM RÊNAS YAMAN



Erê xaltîkê, va ye te mehneya xerabîya kurê xwe dît. Rast e, lê tu qisûrê te tune ye(!) ev kur şîrê mitirban vexwarîye.



Qasim, xortekî dirêj û bedew lê heta hûn bibêjin xirab û nes bû. Hemû zarokên dibistanê jê îlelah kiribûn. Dev ji hemsalên wî berdîn, li yê ji xwe mezintir jî dida. Roj tunebû ku jê gilî û gazin neyê kirin. Ya Rebbî bêlome! Ew çi enerjî û hêza bêdawî bû. Geh radipelikî serê dara û dîreka, geh derdikete serê banê dibistanê.

Rojekê ji bo serdana dê û bavê wî ez çûme mala wan. Li derê mala wan pênc-şeş pîrek hebûn. Bi dengeke bilind dikirin barebar. Yekê digot:

-Serê kurê min şikandîye.

Yekê din digot:

-Ketîye hewşa me hemû xox jêkirine. Heta ku têr xwarîye li serê darê maye. Dû re xox jêkirine û avêtine sikakê. Hey belqitîyo! Hadê te xwar lê tu çima wan davêyê erdê. Bi soz û telaq gur bikeve nav pez hevqas xisar nade mirov.

Yekê din digot:

-Ev kûçikê heram ketîye koxika mirêşkên me, hemû mirîşk peritandine. Rebenê mirîşkan tazî man. Îro sibê wê ji sermayê bimirin. Ka bibêje xwişkê, de ka ez ê çi bikim?

Perê min jî nîn in ku ez ji xwe re mirîşkeke dî bikrim.

Yekê din wiha digot:

-Ev hevalê xerabûnê ye, law hevalê xerabûnê. Perê kurê min jê standîye û têra wî lê xistîye. Ev bêyom bû eşqîya û kete vê dinyayê. Ez dibêim ev ji toxmê Cengiz tê law.

Min di dilê xwe de got: "Xwedê alikarîya malbata wî bike. Ya Rebbî ev çi îmtihaneke zor û dijwar e." Ji nişka ve bûyereke hate bîra min. Ez wê jî bibejim:

Duh ne pêr bavê Qasim hatibû dibistanê. Mamosteyek hingî ji Qasim tengazar bûbû rebeno ji bavê wî re gotibû:

-Bavê vî cinawirî tu yî? Li hember vê pirsê bavê wî serê xwe tewandibû û gotibû:

-Belê mamoste, hezar mixabin bavê vî cinawirî ez im...

Em vegerin ser serdana xwe. Ez gihastim ber devê derîya wan. Ku pîrek çav li min kirin rê dane min. Dîya wî derkete devê derî. Qet li rûyê pîrekan jî nemeyizand. Weke ku helwestên kurê xwe dipejirand. Ji min re got:

-Mamoste, tu bi xêr hatî.

-Nav xêrê de bî xwişkê.

-Xêr e, ji bo çi tu hatî mala me.

Min bi tilîya xwe pîrekên li devê derî nişan dan û min got derdê me yek e. Dîya Qasim got:

-Mamoste, tu dizanî ji bo çi kurê min wilo xerab e?

-Na, ji kerema xwe bibêje.

-Di vê taxê de kes ji me ne aciz e. Lê ez nizanî ev kur li kê hatîye.

Piştî vê gotinê ji nişka ve weke ku tiştê hate bîra wê. Serê xwe rakir û bi dengeke ecêb got:

-Bi Xwedê min dît. Qasim şîrê mitirban vexwarîye. Erê wextê min şîr dida Qasim, rojekê ez nexweş ketibûm şîr tûnebû ku ez bidime wî. Pîrekek mitirb ji bo ku tişt û miştan bifiroşe hatibû mala me. Zaroka wê jî li piştê wê bû. Gava dît ku Qasim digirî rahîştîyê û şîrê xwe dayê.

Li ser vê gotinê kenekî bilind ji rexê pîrekan hat. Yekê got:

-Erê xaltîkê, va ye te mehneya xerabîya kurê xwe dît. Rast e, lê tu qisûrê te tune ye(!) ev kur şîrê mitirban vexwarîye.



# MIROVÊ PENDSTEND

MUSTAFA RÊZAN



Ji wan her sê hevalan, tenê hevalek ji bo pend û şîretan guh li kalemêrî kir. Û zêrên xwe bi pend û şîretan guherand. Lê belê her du hevalên wî pê tinazê xwe kirin.

Kalemêrî got:

-Şîreta yekem; di roja mij û tarî de ji gund dernekeve.

-Şîreta duyem; ji mirovên keçel û diranfîq bitirse. Ti carî wan ewle nebe.

-Şîreta sêyem; Şerê şevê bihêle xêra sibê.

Erêêêêê. Kalemêrî pend û şîretên xwe li wî kir. Wî jî sê zêr da Kalemêrî. Paşê ji dîwana kalemêrî qetiya. Çû cem hevalên xwe. Tiştên ku hatine serê wî, ji her du hevalên xwe re jî got. Her du hevalên wî guh lê nekirin.



Yek hebû. Yek tunebû. Kes ji Xwedê mezintir tunebû. Li gundekî sê heval hebûn. Ev her sê heval, bi hev re mezin bûbûn. Kar û îşê wan bi hev re bû.

Rojek ji rojan ji bo debr û debara xwe ketin rê. Ji war û welatê xwe qetîyan. Dil û çavê xwe li paş xwe hiştin. Çavê wan li rê, barê wan li ling û milan çûn û hey çûn. Her sê heval gihastin bajarekî. Her yek li kar û îşekî gerîya. Û ji xwe re karek dîtin. Ji bo debr û debara xwe xebitîn.

Erêêêêê. Ev her sê heval bi qasî deh salan xebitîn. Her yekî ji xwe re sê zêr qezenc kiribû. Lê belê kul û hesreta war û welat û malbatê dilê wan diperçivand. Li hev kom bûn. Dema vegeerê hatibû. Kar û îş, li cî hiştin. Û ber bi gundê xwe ve vegeerîyan. Ev her sê heval, di rê de li gundekî rast hatin. Ji ber ku bûbû şev û tarî, wê şevê li wî gundî man.

Li gund, kalemêrekî rûyê wî spî û zelal hebû. Ji bo şîret û nesîhetan gelek kes, bi rojan diketin rê û di-

hatin. Ji ber çokên wî şîreta xwe digirtin û diçûn. Xweda, rêya van her sê hevalan li ber rêya vî kalemêrî dagerand.

Kalemêrî got:

-Ez dikanim pend û şîretan li we bikim. Lê belê her tişt bi berdêl e. Ji bo her şîretekê ezê zêrekî ji we bistînim.

Ji wan her sê hevalan, tenê hevalek ji bo pend û şîretan guh li kalemêrî kir. Û zêrên xwe bi pend û şîretan guherand. Lê belê her du hevalên wî pê tinazê xwe kirin.

Kalemêrî got:

-**Şîreta yekem;** di roja mij û tarî de ji gund dernekeve.

-**Şîreta duyem;** ji mirovên keçel û diranfîq bitirse. Ti carî ji wan ewle nebe.

-**Şîreta sêyem;** Şerê şevê bihêle xêra sibê.

Erêêêêê. Kalemêrî pend û şîretên xwe li wî kir. Wî jî sê zêr dan Kalemêrî. Paşê ji dîwana kalemêrî



qetîya. Çû cem hevalên xwe. Tiştên ku hatine serê wî, ji her du hevalên xwe re jî got. Her du hevalên wî guh lê nekirin.

Şeva wan wusa bihurî. Bû sibe. Dîk û mirîşk hişyar bûn. Gur û kûçik ji hev nas bûn. Ev her sê heval jî ji bo rê derketin. Lê çi bibînin! Li derve tarî û mij. Çav çavan nabîne. Tarîqewî li her derê raxistîye. Pend û şîreta kalemêrî, hate bîra wî hevalî. Wî hevalî, ji wan re got ku guh li şîreta kalemêrî bikin. Lê belê dema ku rê li ber lingan be, dil di navêna çar diwaran de ye.

Werhasil du heval ketin rê û çûn. Tenê yê ku şîret stendibû li gund ma. Di sar û seqema wê rojê de, her du heval qefilî bûn. Û çûbûn ser heqîya xwe.

Ew hevalê ku mabû, rojêke din ket rê. Û ber bi gundê xwe ve çû. Di rê de rastî hevalên xwe hat. Lê çi bike! Her du hevalên wî çûbûn ser heqîya xwe. Û koça dawî kiribûn. Wî jî zêrên hevalên xwe hilgirtin û bi dilekî xemgîn ket rê. Çû û hey çû.

Peyv û soza hevalên dilane şikestî mabû. Lê çawa bike. Divê têkeve rê. Û divê talî û gazîya hevalên xwe bigihîne gund. Heta jê hate zor da lingan. Û meşîya. Lê cardin li wî bû şev. Ji bo wê şevê li derekî bimîne, çavê xwe gerand. Çavên wî ji dûr rastî ronîya findekê hat. Xwe li ronîya findê girt û meşîya. Xwe gîhand findê. Li deriyê xênî xist. Û ji hundir dengê hat.

-Kî ye?

Wî got;

-Ez im. Rêwiyekî rêwunda. Gelo hûn mêvanê Xwedê qebûl nakin?

Mazûban;

-Ser çavan! Mêvan bi qismetê xwe tê. Kerem ke.

Ew heval ket hundirê xênî. Dû xêrhatin û nasîne biryara nobeda şevê girtin. Û her yek çû nivîne xwe. Pêşê mazûban çû nobeda şevê. Mêvan jî bi dilek tasewazî xwe li nivîne xwe dirêj kir. Ji ber ku ev mazûban, keçel û diranfîq bû. Dilê wî pendstendî, bi tasewaz bû. Ji ber ku şîreta kalemêrî hatibû bîra wî.

Hevalê pendstend rabû. Balîfa xwe xist hundirê li-hêfa xwe. Û xwe veşart.

Erêêê. Lê nihêrt ku mazûbanê keçel û diranfîq bi dizî hat. Xencera xwe derxist. Û xencera xwe li balîfa di hundirê li-hêfê de ye, xist. Lê hevalê pendstend, ji paş de xwe gîhandê. Û kevirê li serê keçelê diranfîq xist. Û wî li kevirê bergor kir. Mirovê pendstend, keçelê diranfîq kuşt.

Li dû şeveke giran û dijwar, bû sibe. Mirovê pendstend ket rê. Ber bi mal û malbata xwe ve çû. Çû, çû carde li wî bû şev. Hew qas bi rê çû, lingên wî ji wî ketibûn. Wusa westiya bû.

Lê bi çi hawî be jî xwe gîhande malê. De îja çi bibîne! Li cem xanima wî xorteke nûgîhaştî heye. Wer gir û navpî! Hima xort bû.

Di dilê wî de derbas bû, gelo jina wî ji xwe re dost û yar girtine. Lê carek din şîreta kalemêrî hate bîra wî. Û şerê şevê, hişte xêra sibê. Lê gelo ka çawa lê bû sibe. Heta sibê ruhê wî di navêna çar diwaran de asê ma.

Şevê rengê xwe kişand. Sibe hişyar bû. Gur û kûçik ji hev nas bûn. Û mirovê pendstend bi carekê ket mala xwe. Xortê li cem jina wî, got;

-Dayê ev kî ye?

Dayika wî got;

-Dayêcan ev bavê te ye.

Wê carê mirovê pendstend fêhm kir ku ev kurê wî ye. Ji ber ku deh sal, li kar û xebatê bû, kurê xwe qet nedîtî bû. Kurê wî bûbû xortekî bîst salî. Hatibû çax û benda xwe.

Mirovê pendstend, ji berdêla her sê zêrên xebatê, şîretên kalemêrî stendibûn. Û bi serfkeftî gîhaştibû mala xwe. Gîhaştibû war û welatê xwe.

De tu jî xwendevan, bigir şîret û pendan, ji kal û kalemêran, bo rast bikî jiyana xwe.



# KERA MIRÎ YA PIŞKÊ

RIDWAN XELÎL




Piştî çend rojan zilamê kal rastî Mehmedemîn tê, dibîne ku gelek pere di destê wî de hene, ji Mehmedemîn dipirse:

-Lawo te çikir ji kera mirî?

Mihemedemîn dibersivîne û dibê:

-Min kera ku ji te bi 500 lîreyî standin bi pişkeke ku 500 kes serê yekî bi 10 lîreyan beşdar bûn firot.



Mehmedemîn bi zilamekî kal re ji bo kirîna kerekê li hevdu kir.

Lê ji ber ku karê zilamê kal bi kerê xilas nebûbû li hev kirin ku, sibê derdora seat dehan Mehmedemîn, werê kera xwe ji zilamê kal bigire. Lê ji zilamê kal re pere zû lazim bû berîya ku ji hevdu biqetîn Mehmedemîn peryê kalo dane wî û çû malê.

Roja din hate ba kalo û jê pirsî, kalo go kanî kera min wa ye ez hatim kera xwe bibim.

Kalo ji Mehmedemîn re dibêje;

-Kurê min nizamim ez ê ji te re çawa bibêjim, lê heqê xwe helal bike, şevê dî kera ku min firotibû te li koxê mir. Peryên ku te dane min, min ew jî di ber hin deynên xwe de dan, a niha tiştek di destên min de nema.

Mehmedemîn ji kalo re dibêje;

-Kalo dîsa jî tu kera min bîne.

Kalo şaş dibe û dibêje;

-Tê çî bikî ji kera mirî lawo?

Lê dîsa jî Mehmedemînê me ji zilamê kal kerê mirî dixwaze û dibêje;

-Ez ê vê kerê di pişkê de firoşim.

Zilamê kal jî ji bo mesele mezin nebe kera mirî dide Mehmedemîn û Mehmedemîn ji wir diçe.

Piştî çend rojan zilamê kal rastî Mehmedemîn tê, dibîne ku gelek pere di destê wî de hene, ji Mehmedemîn dipirse:

-Lawo te çikir ji kera mirî?

Mihemedemîn dibersivîne û dibê:

-Min kera ku ji te bi 500 lîreyî standin bi pişkeke ku 500 kes serê yekî bi 10 lîreyan beşdar bûn firot.

Kalo:

-Ma beşdarên pişkê bi te de nexeyîdîn?

Mihemedemîn:

-Na tenê kesê ku pişkê jê re derket xeyîdî. Min jê lêborîn xwest û 10 lîreyên wî yê beşdarbûna pişkê vegerande wî, pişt re heqê xwe li min helal kir û çû. Ji bo ku min perê wî lê vegerand kêfa camêr jî hat.

# SED GOTINÊN PÊŞÎYAN

PAŞA AMEDÎ



Min gotinên pêşîyan tenê ji devera gundê xwe (Gundê Qerto ya girêdayê Çermûga Dîyarbekirê) berhev kir. Ev gotinên ku min berhevkirine, dibe ku hinek gotin bişibe gotinên herêmên din jî lê min dîsa berhev kirin. Ji bo ku gotinên pêşîyan ji nav gel derkevin holê da ku çavkanîyek nivîskî ava bibe.

Amadekar  
Paşa Amedî



1. Aqil ji aqil zêdetir e.
2. Aqilê sivik barê giran.
3. Aya vê destê ji deste din re namîne.
4. Bayê kûr erdê dîke çekûr.
5. Bela li ber nigê wî be. (Nifir e)
6. Berf xezîneya erdê ye.
7. Bext, bexta ewûl.
8. Bi tîr û fisana hindir germ nabe.
9. Bigre kala, bixwe mala.
10. Bila ew be bila hew be.
11. Bila sor be bila qurîşekî wê zêde be.
12. Bila Xwedê lêxe.
13. Bira mirina kerê ji ceh be.
14. Bira rûyê mirov bişewûte dilê mirov neşewûte.
15. Çav tîr nabe.
16. Çîya bê dar nabe.
17. Çîya li cihê xwe here jê bawerbikî, însan bibêje min xuyê xwe terk kirîye pê bawer nekî.
18. Dev ji dizan berdan lê diz dev jê bernade.
19. Dev tijî xwîn be jî li cem xelkê tû neke.
20. Di bin sîya darekî de hezar pez mexel tê.
21. Di hereketê de xêr û bereket heye.
22. Di nav de wekî dirîyê reş e.
23. Dinya li ser gohekî wî ye.
24. Dinya sîya darê ye.
25. Dîtin û gotin ne wek hev e.



26. Em ji hev re xurt in, ji xerîb re na.
27. Erê lawo, rizqo belawo.
28. Ewîlî li qusurê xwe mêze bike paşê yê xelkê.
29. Ferqa jin û mêrê weka sêv şên û kesk e.
30. Gohê xwe kirîye palas.
31. Golikê malê ji gayê malê natirse.
32. Gur li ku mirîye.
33. Gur tên hesp û cehnîyan, qisexweşan ker da guran.
34. Gurbin ku gur we nexwin.
35. Henek xweş e lê carekî.
36. Her însan bi dil û xatirê xwe.
37. Her însan exleqek lê ye, her çîyayek gihayek lê ye.
38. Her kes aş û bajarê xwe dibêje.
39. Heta xera nebe ava nabe.
40. Heyfa serê çûyîne.
41. Him zîyaret him tedarek.
42. Ji çîya xeyîdîye çîya bê xeber e.
43. Ji hev re qul in.
44. Ji kê tirsîyan, wî pirsîyan.
45. Jê ve davêje.
46. Karên betalan çi ye?
47. Kevir li cihê xwe giran e.
48. Ku derguş negrî dê şîr nadyê.
49. Li mala xwe rûne, kulikê xwe xwarke.
50. Mala fireh, çekê fireh, dilê fireh.
51. Malbata keçikê bi naz e.
52. Malên nekesa comerd dixwin.
53. Maşalla çel bi te nekeve. (Nifir)
54. Min li pêşîya min nepisîne, li paş min bipesîne.
55. Mîna xerîbê heftê bavî.
56. Mirin hespa boz e, her carê li ber derê yekî ye.
57. Mirin pakî ye.
58. Mirov bi çekan, xanî bi eşya, heywan bi goşt xweş e.
59. Mirov ku zanibe kîjan rojê bimre wê mezara xwe vede.
60. Mirov ne ji germê re ne ji sermê re dibe.
61. Mirov rez dayê nikare goşîyekî bidîyê.
62. Mirovê bê xanî weka qereçîya ye.
63. Mirovê nefê qewmê xwe neyê, nefê tu qewmê jî nayê.
64. Mirovên mirov, ji mirov nayê şûştin.
65. Nan û ava wî li dinyayê maye.
66. Ne dixwe ne dide.
67. Ne dixwe nedirfî.
68. Ne ji defê re, ne ji zirnê re dibe.
69. Newala kûr bê av nabe.
70. Nifir bi nêvî ye.
71. Nigê dîk di tawê de dîtîye.
72. Paşî û paşîya wî hew be.
73. Pêlên mêran mîna pêlên behrê ye.
74. Pênc deqe sebir bike, pênc sala bijî.
75. Pêşa wan davêje serê wan.
76. Piçîyên mirov wekhev nabin.
77. Pîr bûye dîsa piçûk bûye.
78. Porê xwe jê re kirîye sindik.
79. Qehpetî ne hindik bû, qundetî da ser.
80. Qelî bi serê çîvikan çê nabe.
81. Qisura xwe nabîne yê xelkê dibîne.
82. Qîz û kurê vî zemanê bê yar nabin.
83. Rih şêrîn e.
84. Rizqê her kesî pê re tê.
85. Rojên bijartî zû diqedin.
86. Rovî neçû qulikê tevalek bi qûna xwe ve kir.
87. Sewirî dewirî.
88. Siwarê hespê bi siwarê kerê qayîl nabe, siwarê kerê jî bi siwarê hespê qayîl nabe.
89. Tas çîngîya, ha rast ha derew.
90. Texmîna sekinandinê nabe.
91. Tim hesinê xwe lê dixê.
92. Tirs û rev jî yê mêra ye.
93. Weka marê reş e.
94. Weka pisika heft rih e.
95. Xanî nekirin, ciranan bikin.
96. Xelk bû kebanî, ez bûm cebanî.
97. Xelkê xwe da ber mala wî, ew xwe da ber dîwara.
98. Xelkê qîzên me birin, guran lawê me birin.
99. Xêran bike bira bi avê re here
100. Xwedê bidîyê, lê pê nede xwarin(Nifir)

# MIŞKÊ ZENGÎN

MAŞÎTA AMEDÎ



Ku mişkekî ne zengîn bibana,  
nedihat ser sifrê nedihat nan  
nedibir, mişkê feqîr wiha nake  
çîmkî mişkê feqîr qure ye.  
Werîn em vî mişkî bişopînin ku  
wer nebe hûn ji min re çi dibêjin  
bibêjin?



Di malekî de mişkek hebû, malbat çiqas xwarina xwe dixwarin ew mişka tim dihat ser sifrê nanek digirt û direvand. Malbat xwe ji mişkê pa nedikir.

Rojekî mîvanê wan hat, hazirîya xwarinê kirin, sifre raxistin dest bi xwarina xwe kirin. Di wê demê de mişk hat ser sifrê nanek girt û revand. Mîvan got: “Ev çi mişk e ku ji we natirse, tê ser sifrê nanek digre û direvîne?” Malbat got:

- Em çiqas sifra xwe radixin ev mişka tê ji ser sifra me nanekî digre û direvîne. Mîvan dibêje:

- Ev mişka ku çi heye mişkekî zengîn e, ku ne zengîn bûna curetê nedikir ku bihata ser sifrê nanek bigirta û birevanda, çi heye ev mişka mişkek zengîn e û têr e, ku mişkek birçî an feqîr biba wer nedikir.

Malbat:

- Dixwazî çî bibêjî mîvan?

- Ku mişkekî ne zengîn bibana, nedihat ser sifrê nedihat nan nedibir, mişkê feqîr wiha nake çîmkî mişkê feqîr qure ye. Werîn em vî mişkî bişopînin ku wer nebe hûn ji min re çi dibêjin bibêjin?

Malbat û mîvan mişkê dişopînin; digîhîjin hêlîna mişkê, mêzedikin ku hêlîna mişkê tijî zêr, zîv û nan e. Malik dîne zêr û zîv digire hindikî dide mîvan, mîvan diçe mala xwe.

Rojekî mîvan xwedîyê malê dibîne û jê re dibêje:

- Mişkê we çi bû, tê ser sifrê ana? Malbat dibêje:

- Tu mafdar bî, ew mişkê me feqîr ket, êdî mişk nayê ser sifrê, em ji mişkê xelas bûn.



# BIRÎNA PÎRÊ

PAŞA AMEDÎ



Jinebiyek bi neçarî û feqîrtiya xwe bi karên gundiyan debara xwe dike, zarokên xwe mezin dike. Ku zarokên wê gihîştin, ku karen bajarî ji wan tê, pîrê zarokên xwe civand û ji wan re dibêje: “Zarokno, fikrekî min heye ku hûn jî pipejîrînin, em ji gund derkevin, herin bajarê Diyarbekirê, dibêjin ‘Diyarbekir, cihê zengîn û feqîran e, her kes xwe tê de xwedî dike û bi rehetî jiyana xwe dewam dike’ hûn dibêjin çi?” Zarokên wê tev jî dibêjin: “Dibe, dayê, çima nabe, jixwe erd û zeviyên me tunin, em li ber destê xelkê dişxulin...”

Jinebî û zarokên xwe mala xwe bar dikin derin bajarê Amedê. Xaniyek piçûk ji xwe re kirê dikin. Zarok ji xwe re kar bi destê xwe dixin û dişxulin. Ku debara wan xweş bû; pîrejin zarokên xwe dizewicîne. Sal derbas dibin zarokên wê navsal dibin, tornên wê jî diçin mektebê dixwînin. Dayîk jî sal bi sal pîr dibû, bû bi sal. Çavên wê êdî nedîdît, lê dilê dayikê ne xweş bû. Pîrejin tenê bi nimêj û îbadetê ve mijûl dibû; zikir û wîrdên xwe didomand, pê dilê wê xweş dibû, sebra wê pê dihat. Lê dayîk her tim dilê xwe xerab dikir, ku ne ji nimêj û taetê biba wê dîn biba û bi

çolê biketa. Car jî ku jê bihata wê ji zarokên xwe re bigotana “min bibin gundê min...” Lê nikaribû dest ji zarokên xwe bike.

Jinepîr ji zarok, bûk û tornên xwe pir hez dikir; û bi wan kêf digirt. Lê jiyana wê ne tu jiyana bû, her tim difikirî... Zarokên wê fehm kiribû ku derde wê heye lê derdê wê nizanibûn. Zarokên wê carna digotin: “Dayê, dayika min, derdê te çi ye, tu çima derde xwe ji me re nabêjî?..” Diya wan jî: “Ez çi bibêjim, lê jiyana min, ne tu jiyana e.” Û dev jê berdida.

Çend roj çû, ku bû “of, of” a pîrê. Kurê mezin ji diya xwe re: “Dayê, tu yê derdê xwe ji min re bibêjî, ka dertê te çi ye? Gelo bûk nan nadin te, li te tehdê dikin, an jî me dilê te ji xwe hîştî ye...” Dayik mêze dike ku kurê wê ji wê nagere. Pîrê dest bi derdê xwe dike û dibêje: “Kurê min, ez diya we me, ez pîrejin im, ez xwedî zarok im, mala min heye, ez ne birçî me, lê hûn ji halê min fehm nakin, ez jî ji we. Hûn bi zarok û jinên xwe re qise û galegalan dikin, kêf kêfa we ye. Lê hûn li min nafikirin?” Kurê wê:

- Çima, çi bûye?



- Çer çî bûye, kurê min, ez çawa ji we re bibêjim; we orf û edetê xwe ji bîr kiriye, çekên we bûye weka biyaniya, ferqa jiyana we û gawuran ferq nake

Ya din; hûn derin karên xwe û tîn, jiyana ji we re xweş e, lê hûn nabêjin em, jin û zarokên me di çî halî de ne. Ez qayîlim ku ji tornên xwe hez bikim, bi wan re qisan bikim û bibêjim, ku ez ji wan fehm bikim, ew jî ji min. Ê din wexta ku hûn bi jin û zarokên xwe re qisan dikin ez ji we fehm nakim, bi we re nakenim û nagirîm. Ku kurê mirov, bûk û tornên mirov bi zimanê xwe yê Kurdî qîsa neke û bi zimanê Tirkî qîsan bike wê diya we çawa ji we fehm bike û bi derd û şahiya we kêf û xemgîn bibe.

Kurê min, rewşa we û yê min ne baş e. Yanê ku hûn, bûk û zarokên xwe bi min re qise nekî, hûnê bi kê re qisan bikin.

Ya din jî hûn heya êvarê bi jin û zarokên xwe re bi zimanê Tirkî qîsan dikin, ez ji we fehm nakim. Hûn televîzyonê vedikin heya sibê ziman bi Tirkî ye, hûn jê fehm dikin lê ez, ez ji ber zimanê we yê bi Tirkî

bi we re her tim ker û lal im. Jixwe çavên min nabîne, qene ji gotin û qisên we fehm bikim. Li malê eciz dibim û dilê min teng dibe. Hedûriya min nayê û bîrîna min kûr e.

Gelo haya we ji we heye? We xwe daye zimanê Tirkî, we jiyana diya xwe mehf kir, yê zarokên xwe jî. Ku zarokên we bizewicin wê zarokên tornên we bi çî zimanî qise bikin. We zimanê bav û kalên xwe jibîr kir, we bi zimanê xerîb girt. We jiyana li min herimand. Bûk û zarokên me bi Tirkî qîsan dikin, cîranê me tîn, ew jî bi Tirkî qîsan dikin, mirovên me tîn mala me dîsa bi Tirkî qise dikin, ez dîsa ji we fehm nakim, tornên min carna tîn cem min, tenê dibêjin "Pîrê, çawa yî, baş î?" Kurdiya wan tev ew e û diqede.

Hezkirina tornên min di dilê min de maye, ku ez dixwazim destê xwe di serên wan bidim û paç/maç bikim, ji min direvin, ji bo çî ji min direvin, ji ber ku ji min fehm nakin. Hûn jî zanin ku mirov bi rêya qîsan ji hev hez dike û bi hev şêrîn dibe. Ku ziman tunebe û ji hev fehm neke, mirov ji hev sar dibe. Hezki-

rin bi ziman û qiseyan dibe. Law me em ji ku hatin; hûn kî ne, bûkên me û em tev bi Tirkî nizanîbûn, niha jî li xwe nagrin ku bi kurdî qîsan bikin, xwesika Tirkiya we jî baş biba. Li xwe haydarbin; hûn nizanin bi Tirkî jî qîsa bikin kurê min, ji ber ku hûn bi Kurdî qîsan nakin, zimanê me ji we û ji bûkên me re xerîb tê.

Kurê min, ez mirov im, hestên min jî hene; ku ez bi we re, hûn bi min re qîsan nekin an ku ez ji gotinên we fehm nekim ez ji we çawa kêfê bigrim. Qey ez li malê ne kevirê ser dîwanê me, ez ji dîwarê re qîsa bikim

Gelo ez şaş im an hûn şaş in. Lê niha ez di çî halî de me hûn nizanin. Ji xwe çavê mim nabîne, jiyana min tarî ye. Ez li mala xwe me jî ez dibêjim qey ez li mala Tirka me û nîvanim. We jiyana xwe heram kir û jiyana min jî... esl, kok û zimanê xwe ji bîr nekin, jiyana xwe jî li gor dîne Muhammedî bajon. Ji xwe re aqilê xwe bînin serê xwe û jiyaneke nû dest pê bikin. Kurê min hîna jî hûn pir dereng nema ne...."



# HELEBÇE

## BERKEN BEREH



em bi hevre mirin mirovno!  
 pênc hezar insan  
 ne şinahiya asîman  
 ne xweşikbûna kûlîlkan  
 û ne jî berbangên awaz-çivîk xema me ne êdî.  
 stranên me yên evîniyê rawestiyân  
 lê negerin  
 naxuye  
 di bîbûkên me de jîyan.  
 ji xwe em xizimê hev bûn  
 xewin û xeyalên me wekhev  
 em bi hevre mirin  
 pênc hezar insan.



### PÎR û KAL

min tu car nebîhistibû dengê wî wiha  
 bêhneke wiha min nekişandibû cerga xwe  
 derewan nakim.  
 dibe ku kêla min ne ji mermerê bûya  
 an we kûlîlkek neçikanda li ser gora min.  
 jixwe  
 nîvmirî bûn em  
 tirsiyam dîsa jî  
 derewan nakim.

lê ew zarok çima bi me re ne  
 qey wê ne jîyan  
 bê nasnav be jî  
 an xizaniyek bi xedar.

### DERGÛŞ

çi bêjim bê feyde ye  
 hatin û çûn a min bi hev ra  
 ji xwe  
 hê nav jî li min nehatibû kirin.

### DAYIK

va bêbavan  
 pirtukên pîroz jî nexwendine  
 ji evîne bê par in  
 berxê min di dergûşê de ma  
 destên min bûn dareke hişk  
 û me hev hembêz nekir.



**ZAROK**

min digot qey  
 ev jî lîstokek e  
 hey hawar dikim  
 kes nayê banga min  
 goga bavê min îroj kirî jî  
 ma di hewşê de  
 wê kî pê bilîze gelo  
 kes ma?

**MAMOSTE**

çiqas li min xweş dihat  
 evîne hîne zarokan kim  
 hevaltî, biratiyê  
 hê zengila betlanê lê nexistibû  
 ev mirin çima  
 û li depreşê nîvco ma  
 nivîsa serfiraziyê.

**AXA**

ev çend mal û milk  
 ev çend dirav û zêr  
 û bêdadiya min  
 nekarî rawestîne mirinê  
 min digot wê em ne tê de bin  
 çima em haydan nedan?

**XORT**

min gustîlkek kirîbû  
 ji bo gulbihara xwe  
 va em bi hev re çûn  
 wê bidin yeke din  
 min ji bo wê hewce nema.

**HELBESTVAN**

kê digot  
 wê evqas bi wate be helbesta me  
 ku tucar pênuşa min  
 xwîn nerijand.

**ŞIVAN**

hê nû zayîbû  
 berxa bizina bedew  
 yekcar şîr nemêtîbû hê  
 li ber xwe nakevim  
 bizanin  
 me bi hev re veşêrin  
 di bextê we de me  
 bi seyê har re.

**XWEDA**

e jî şaş mam, bawer kin  
 kê destûra vê komkujiyê da?  
 li min biborin  
 ketime bextê we

**MIROVAHÎ**

hûn bi hev re mirin  
 bi wekhevî, bi biratî  
 rûreşî para me!

**DÎROK**

bû deqek tenî  
 rûnişt li ser eniya min  
 navê te Helebçe



# YA RESULELAH

DILBIKULÊ CIZÎRÎ



Ji hesret her zemanî çav  
Girînim ya Resûlellah!  
Ji mêlak û ji dil da tev  
Birînim ya Resûlellah

Li ser dev tim de qala te  
Binêrim bejn û bala te  
Dixwazim ez cemala te  
Bibînim ya Resûlellah

Ji bo min hezkirin şert e  
Li bîra xo tînim her te  
Selatên bê jimar ser te  
Dixwînin ya Resûlellah

Ez im ez Dilkulê jar e  
Ji bo min ger nebî yar e  
Dê roja heşrê bêçare  
Bimînim ya Resûlellah



# EZ ZAROK IM

QASIMÊ XELÎLÎ



Diyarî  
bo her  
zarokêkî  
Kurd e

...  
01.06.2017



Ez zarok im  
Leyîstok im  
Bexê dê me  
Şîrînok im

Şêrê bav im  
Şûm her gav im  
Kehrê çê me  
Ez xweşkok im

Hem rewşen im  
Û rûken im  
Ez wek gula  
Berberok im

Her tim şîn im  
Te'm şîrîn im  
Liba tîrhê  
Taîfok im

Ez tîrêj im  
Pêşeroj im  
Xwedî mêjû  
Hem dîrok im

Ez hêvî me  
Wek fêkî me  
Bêhna çi me  
Şîmamok im

Te'ma jîn im  
Xwînsîrîn im  
Rind û bedew  
Wek pîvok im

Ez zîrek im  
Pir wêrek im  
Tu caran ez  
Ne şermok im

Kurdîaxêv  
Zanîstpalêv  
Pê bizanin  
Qurm û kok im

Qasî melek  
Paqij gelek  
Xelkno welle  
Ez zarok im



# RONDIKÊN ME YEK RENG IN

MEHMET AYDIN



25.12.2017

Batman



Reş û spî em tev yek in li cem Xweda ferq nîne  
 Ji yek dê û ji yek bavî, lewra tev Ademî ne  
 Hin jî reşik, hin jê zer, hin sor û hin spî ne  
 Reng û ziman hezar heb reng, rondikên me yek reng in

Rondikên me tev wekî hev xwîna me teva sor e  
 Lê çî bêjim ku nabîne mirovatî çî kor e  
 Yê mezlûm û hejaran re ev dinya wekî gor e  
 Reng û ziman hezar heb reng, rondikên me yek reng in

Hezar heb reng cuda cuda nalînên me wekî hev  
 Şerm e em li ser hev negrîn hem bi roj û hem bi şev  
 Li ber zilm û zordariyê çîya nahejînin tev  
 Reng û ziman hezar heb reng, rondikên me yek reng in

Ey têkoşîn dil bû pereng ranazayê ji do ve  
 Ê li ser mirovan nasoje şêx be jî ne mirov e  
 Guh nede rî û şaşikan!, qenc bizan e ew hov e  
 Reng û ziman hezar heb reng, rondikên me yek reng in

# NE XÊRA WE Û NE JÎ XIRABÎYA WE

MELA MIHYEDÎN



Ev mirovên “qûn neşûştî” radibin ji xelkê re qala nimêjê dikin. Tiştekan pir sosret e. Nizanin destmêjê bigirin ji me re qala çîrokên nimêjê dikin. De rahijîn teşkên xwe û biqîştin ji vir û ji vî welatî. Bela xwe ji me vekin û destên xwe yên ku bi xwîne û bi cahiltîyê hatîyê şûştin ji jîyan û ji cîhana me bikşînin.



Di vê dinyaya derewîn de her kesê ku bi qasî misqalekê tiştekan xwendî an jî bi qasî nîv misqalê tiştekan fêrbûyî xwe tiştekan dihesibîne. Kerê çolê pir in li dinê û her kerek nîv rastîyekê an jî bi şaşîyekê girtîyê û hey dibêje “evreka evreka” yanî “min dît, min dît.” Helbukî di rastîyê de tiştê ku dîtîna têra qunika diranan jî nake lê dîsa jî îdîa dikin ku tiştê dîtîna wê pê cîhanek têr bibe û dê herkesê pê bigihîje xêr û xweşîyê.

Mirovên ku xêr û xweşî nedane laş û canê xwe wê çawa wê xêr û xweşîyê li cîhanê belav bikin. Bi qasî misqalekê jî feyda wan nagihîje wan û ne jî digihîje derdora wan lê dîsa jî bi ser de dibêjin, “em ê cîhanê rizgar bikin.”

Ev mirovên “qûn neşûştî” radibin ji xelkê re qala nimêjê dikin.

Tiştekan pir sosret e. Nizanin destmêjê bigirin ji me re qala çîrokên nimêjê dikin.

De rahijîn teşkên xwe û biqîştin ji vir û ji vî welatî. Bela xwe ji me vekin û destên xwe yên ku bi xwîne û bi cahiltîyê hatîyê şûştin ji jîyan û ji cîhana me bikşînin.

Hûn şevreşk in. Kar û barê we xof e û hûn dixwazin wê tovîkê xofê li dilê hemû mirovan biçînin. Hûn dixwazin hemû mirov têkevin bin sîwana we.

Ne şeva me, ne jî roja me tarî bikin. Biqîştin ji vir. Me bi roja me, bi stêrkên me û bi hîva me re bi tenê bihêlin.

Em besî hev in û em têra xwe jîyanê ronî dikin bi ser me de ewrên xwe yên tarî neşînin. Em zarok û mezinên cîhanê ne, em keç û



xortên cîhanê ne û dê wisa jî be. Em naxwazin mezintîya we û em naxwazin desthilatdarîya we.

We ev dinya xwar û ji ber we hestî jî nema ku em bikojin. We hem para xwe û hem jî para mirovên din jî xwar û carek tenê jî hûn nefikirîn û we negot ka bi qasî serê derzîyekê em alîkarîyê bidin mirovên jar û belengaz. Her tim we xwe û bêrîka xwe difikirî.

Hemû gotinên we û hemû zanebûna we timî ji bo menfeata we xizmet dikir. Ew Xwedayê ku rojek tenê jî nedihat bîra we, dema ku gotin dihat ser heqên mirovên kedkar we xwe dispart peyva Xwedê û dîn. Di rastîyê de dîne we û Xwedayê we “pere” bûn û ji xeynî pereyan tu qiblegaha we tunebû. Lê ji bo ku hûn mirovên kedkar bixapînin we peyva Xwedê, Qur’an û dîn ji devê xwe betal nedikir.

Hertiştên we û hemû xeбатên we ji bo xapandinê bû û hûn bi xwe hostayên xapandinê bûn û timî hûn digihaştin meqseda xwe. Bes êdî! Bela xwe ji me vekin.

Îdeolojîya we “Pereîzm” e û hûn “Pereperest” in. Tu eleqeya we û ya me bi hev nîn e. Em mirovperest in, daxwazîya be başî û qencîya mirovan û mirovahîyê ye.

Bes e êdî xapandina we. Bes e êdî zilma we. Bes e êdî êrîşên we. Bes e êdî malxirabîya we. Bes e êdî dagirkerîya we. Bes e êdî zordarîya we. Bes e êdî tacîz û tecawîzên we. Bes e êdî xayîntîya we. Bes e êdî durûtîya we. Bes e êdî derewên we. Bes e êdî zordarîya we. Bes e, bes e, bes e...

Êdî bes e! Mirovên kedkar, mirovên bi rûmet, jin û mêrên hêja, zarok û pîrên xwoşewîst û xwendevanên delal. Ma heta kengî tarîfî, bila êdî derkeve ronahî. Ji bo rojên xweş û geş dest bidin hev bi dilgermî.

Heta hûn nexwînin baş, dê barê me tim bimîne li paş.




# DI MALBATÊ DE TÊKILÎYÊN JIN Û MÊRAN

FATMA GÜNEŞ SAVLUK



Her wiha jin û mêr divê li hemberî hevdu dengê xwe jî bilind nekin. Li hemberî hevdu rêzdar bin. Li gor min rêz ji hezkirinê pêştir e. Lewre eger eşq û evîn di navbera jin û mêran de xelas bibe jî bi ya min hurmet û rêzdarî dikeve cihê evînê. Lê belê heger rêzdarî ji holê rabe, jixwe eşq û evîn jî ji holê radibe. Ya girîng rêzdarî ye. Divê tu caran ev rêz di navbera jin û mêran ranebe.



Di civakê de damezrake herî piçûk bê gûman malbat e. Xurtbûna malbateke weke xurtbûna civateke ye. Em dikarin bêjin ku bingeha civakê malbat in. Malbat ji dê, bav û ji zarokan pêk tê. Ji bo ku dê û bav ji bo zarokên xwe mînakên ewil in divê têkilîyan wan gelekî xurt be.

Têkilîya jin û mêran an jî dê û bavan çiqas xurt be ji bo psîkolojîya zarokan ewqas baş e. Zarok jî di dinyaya xwe de aram û bextewar dibin. Lewra zarok pêşeroja malbat, civak û mirovahîyê ne. Ji ber vê yekê jî têkilîya di nav malê de gelekî girîng e. Ew têkilî civatekê peyda dike.

Di malbatê de têkilîya herî girîng bê gûman a jin û mêran e. Li gor dîne Îslamê jî armanca zewacê di malbatê de pêkanîna bextewarî û aramîyê ye. Armanceke din jî ji civakê re temînkirina nîşeke baş e. Piştî zewacê divê jin û mêr li hemberê Xwedayê Teala berpîrsîyar in ku rîayetê heq û mafên hevdu bikin. Ev heq û maf ji xeynî reîsîtiya malbatê weke hevdu ne.

Zewac kesayetîya jinan ji holê ranake. Kesayetîya mêran yê dadmendî û civakî mafên jinê asteng nake. Jin dikare bi navê xwe jîyana xwe berdewam bike. Malên xwe çawa bixwaze dikare bikar bîne.

Jin û mêr divê bi nîyeteke baş li hevdu binêrin. Dîsa divê li hemberî hevdu bi exleqeke baş tevbigerin. Resûlê Xwedê (s.e.w) di hedîseke xwe de wiha kerem dike: "Di nav we de yê herî baş ew kesên ku ji bo malbata xwe herî baş in."

Di hedîsê Resûlê Xwedê de tê dîtin ku divê jin û mêr di malbetê de ji hevdu re baş bin. Qedr û qîmeta hevdu bizanibin. Divê mêr eleqeyê nîşanê jina xwe bide jin jî nîşanê mêrê xwe bide. Ji ber ku herdu jî nekevin rêyeke nebaş û nekevin rêyeke xeyrî meşrû.





Çi jin be çî mêr be divê îffet û namûsa xwe biparêzin. Ji xwe Xwedê Teala di sûretê Nûr ayeta 30an de wiha kerem dike; " Ji zilamên mumîn re bêje ku bila çavên xwe ji heramiyê biparêzin. Bila namûsên xwe ji zînayê biparêzin." Bi rastî di civaka me yê niha de mixabin weke ku divê tenê jin xwedî namûs in û divê jin xwe biparêzin. Lêbelê weke ku di ayetê de jî tê dîtîn ne wisa ye. Hikmên Xwedê Teala him ji bo jinan him jî ji bo zilaman e.

Li gor Îslamê wezîfeyê mêran ev e ku divê ji malên xwe, yan jî li gor hebûna xwe hewcedarîyên jinên xwe temin bikin. Divê mêr tu caran ji jina xwe re nebêje tu ne xweşik î. Divê mêr her tim kêmasîyên jinên xwe negere û venekole. Divê mêr tu caran li jina xwe nexe. Divê mêr li hemberê jina xwe rêzdar be. Heq û mafên wê biparêze. Divê bi jina xwe re îstîşare bike û fikrên wê hilîne.

Li gor Îslamê wezîfeyên jinan jî wiha ne; Divê jin di meseleyên meşrû û Îslamî de ji zilamê xwe re îteat bike. Divê jin mal û milkê zilamê xwe biparêze. Jin divê sirên malbatê xwe, namûsa xwe û zarokên xwe

biparêze. Divê jin bê sedem ji zilamê xwe berdanê nexwaze. Dîsa li gor îslamê wazîfeya jinan ya herî girîng memnûnkirina zilamê xwe ye. Li ser vê Resûlê Xwedê di hedîseke xwe de wiha kerem dike; " Her kî-jan jin be ku mêrê wê jê razî be û bi wê halî wefat bike wê têkeve bihûştê/cenetê."

Her wiha jin û mêr divê li hemberî hevdu dengê xwe jî bilind nekin. Li hemberî hevdu rêzdar bin. Li gor min rêz ji hezkirinê pêştir e. Lewre eger eşq û evîn di navbera jin û mêran de xelas bibe jî bi ya min hurmet û rêzdarî dikeve cihê evînê. Lê belê heger rêzdarî ji holê rabe, jixwe eşq û evîn jî ji holê radibe. Ya girîng rêzdarî ye. Divê tu caran ev rêz di navbera jin û mêran ranebe.

Her wiha di malbatê de wezîfeya her kesî cuda cuda ye. Divê her kes wezîfeyên xwe baş bizanibe û li gorî wezîfeyên xwe tevbigere. Ez bawerim heger her kesek li gor wezîfeyên xwe tevbigere him pirsgirêkên malbatî him jî pirsgirêkên civakî wê çareser bibin.

# DI GEŞEDANA ZAROKAN DE HELWESTA DÊ Û BAVAN Û KESAYETA ZAROKAN

■ AYETULLAH X HASANOGLU



Mirov ji bo ku jîyana xwe berdewam bikin helbet pêwîst e ku bi mirovên derdorê xwe re têkeve têkilîyê. Bi vê têkilîyê re bere bere civakek xwedî taybetmendîyên xwe derdikeve holê. Di dawîyê de ev têkilî çandek ava dike. Ji xwe çand jî ew tişte ku gel û neteweyan ji hev diqetîne. Vêga helbet li ser avakirina çandekê bandora hêmanên curbicur çêdibin.



Li gor encamê xebatên van salên dawî, di geşedana kesayeta zarokan de helwesta dê û bavan cihekî taybet digire. Mirov ji bo ku jîyana xwe berdewam bikin helbet pêwîst e ku bi mirovên derdora xwe re têkeve têkilîyê. Bi vê têkilîyê re bere bere civakek xwedî taybetmendîyên xwe derdikeve holê. Di dawîyê de ev têkilî çandek ava dike. Ji xwe çand jî ew tişte ku gel û neteweyan ji hev diqetîne. Vêga helbet li ser avakirina çandekê bandora hêmanên curbicur çêdibin. Çi ne ev hêman? Helbet hêmanên olî, hemanên aborî, erdnîgarî û hwd. Dê û bav jî di nav civaka xwe di bin bandora van hêmanan de tevdigerin. Pisporek geşedana derûnîya mirovan jî di mezinkiran û gihandina zarokan de li ser heft helwestan disekin. Ka em bihev re lê binihêrin ka çî ne ew helwest.

## 1. Helwesta Demokratîk

Di geşedana zarokan de pisporek vê helwestê ji bo dê û bavan îdealîze dikin. Ev helwest li pêşberî zarok, pêdivîyê bi hestên ewledêrî û xweşbînîyê dibîne. Dê û bav yanê ebeveynên ku bi tevgerên xwe ji bo vê helwestê mînak tene nîşandayîn di biryarên zarokan de wan bi serê xwe dihêlin da ku bi ya xwe rêyeke hilbijêrin. Ev dê û bav rêzikan nîşanî zarokên xwe didin lê di dewsa wan de tu carek biryarê nadin. Ji bo zarokên xwe rewşeke wisa diafirînin da ku zarok bikaribin bi awayek xweser biryara xwe bidin.



## 2. Helwesta Desthilatî

Dê û bavên li gor rêzikên vê helwestê tevdigerin teqez rêzê nadin biryara zarokên xwe. Bi ya dê û bavên desthilatî, zarok nizanin serê xwe biryaran bidin. Di vê helwesta welê desthilatî û otorîter de; dê û bav zarokên xwe di çarçoveya hinek tixûbên tund de girtî dihêlin. Bi ya wan gere zarok ji van tixûban derneyên derve. Bi awayê ku pispor dibêjin zarokên ku bi vê helwestê mezin dibin her tim şermok, tirsonek, û bêlibat dibin. Ji bo ku dê û bav ji wan re bûne mînakeke nebaş zarok jî bi ya wan dikin û di bin kesayeta xwe de helwesteke êrîşkar diafirînin.

## 3. Helwesta Perfeksiyonîst

Dê û bavên perfeksiyonîst ango têtûxwaz ji bo serkeftina zarokên xwe serî li zext û zordarîyê dixin. Ew bi vê helwesta xwe dixwazin ku zarokên wan ji hevalên xwe serkeftî bin. Bi vê hîncetê jî zarokên xwe hertim bi zarokên din re miqeyese dikin. Tu car bi serkeftina zarokên xwe qayîl nabin. Zarokên ku bi vê helwestê mezin dibin hêrsok û çalak dibin. Lê dibe ku bisernekevin û serhildêr û serkêş jî bibin.

## 4. Helwesta Hevnegirtî

Dê û bavên ku di vê helwestê de ne li pêşberî zarokên xwe di hîn helwest û tevgeran de bêdeng in. Car heye dê tiştek dibêje, bav tiştek din. An jî car heye piştgirî didin tevger û biryarek zarokên xwe, lê rojek din piştgirî didin tevgerek wan ya berevajî tevgerek berê. Zarok jî bi vê helwesta dê û bavên ya tevlihev nizane çi bike. Lewre li pêşberî heman tevgerek dibîne ku rojek tiştek gotine rojek din tiştek. Zarokên ku di bi vê helwestê mezin dibin bi giştî dibin xwedîyê kesayetek bêdeng.

## 5. Helwesta Bêpewend

Hîn caran mirov dibîne ku hîn dê û bav qet pêwendî nîşanê zarokên xwe nadin. Hebûn û tunebûna wan ji bo dê û bavên yek e. Hîn caran ev helwesta dê û bavên lu pêşberî zarokên wan derdikeve asta neyartîyê ye. Zarokên ku bi vê helwestê re rûbirû dimînin nabin xwedîyê kesayetek bêqisûr. Ev yek jî di geşedana wan de dibe sedema afirandina hîn pirsgerêkên gîyanî û rûhî.

## 6. Helwesta Xweşbînîya Bêhed

Belê hîn dê û bav jî hene ku tu sînorek nakişînin pêşîya zarokên xwe. Zarok çi bikin ew ji wan re deng nakin. Zarok dema vê helwesta dê û bavê xwe dibînin û bi serê xwe tevdigerin û car caran zirarê didin xwe û dora xwe. Zarokên bi vê helwestê mezin dibin, ji dîsîplînê dûr dimînin. Ev zarok di jîyanek bê tixûb û bê rêzik de dijîn. Ji bo geşedana wan ev helwest nayê pêşniyar kirin.

## 7. Helwesta Piştevanîya Bêhed

Dê û bavên bi ya vê rêzikê ku zarokên xwe mezin dikin, li ser zarokên xwe tim diricifin. Naxwazin carek be jî zarokê wan bi wan de bigirîn. Naxwazin zarokên wan ji wan cihê bibin. Bi ku de biçin, didin dû zarokên xwe. Naxwazin zarokên wan bi derfetên xwe pirsgerêkên xwe çareser bikin. Zarok jî ji ber vê helwesta dê û bavên xwe bi hestên bêbawerî mezin dibin. Bi serê xwe naxwazin carek bikin. Ji bo geşedana gîyana van zarokan jî ev helwest helbet nayê îdealîze kirin. Lewre zarok ji hestên xweserîbûnê dûr dimînin.



# NESAXIYA KESAYETA PAŞKÊŞ/ŞERMÎN

Der. EDA GÖKDUMAN | Wergera bo kurdî OMER DILSOZ



Tedawî/Çareserî: Ev kesên ha, her çendî gelekî pêdiviya wan pê hebe jî zû bi zû bo çareseriyê serî li psîkiyatrist an jî psîkologan nadin. Ji ber ku metirsiyên wan gelek in dibe tedawiya wan neçe serî. Dema terapiyê gava kêmasiyeke biçûk jî çêbibe ev kesên ha, zû bi zû xwe didin paş û ji rêyên çareseriyê digerin. Ancax ku ev kesên ha û şewirmend û terapîstê wan bikaribin têkiliyeke ser binemayê baweriyê çêkin ew dikarin terapiyê dewam bikin. Wek tedawî jî, hunerên wan ên sosyal dikarin bêne xurtkirin, bi rêbazên reftarên têkilîsaziyê tedawî dikare bête bipêşxistin.

Ger nesaxiya van kesan gihîştibe asta fobî/tirsa sosyal wê demê pêwîst e tedawîya dermanan bête pêkanîn .



Ev kesên ha, di nav civakê de nikarin xwe nîşan bidin, kêma hurmeta xwe digirin û ew kes di têkiliyên sosyal û komelî de sist û lawaz in. Wisa hizir dikin ku kesine dî zû bi zû wan qebûl nakin, bi wan razî nabin û dê rexneyan li wan bikin. Ew kes tim rexneyê li xwe digirin, kêfa wan bi wan nayê û her dem bi xwe ve mijûl in. Reftarên van kesan ên berbiçav ew in ku xwe nade ber têkiliyên komelî/sosyal, di nav civat û kombûnên civatî de cihê xwe nagirin û xwe naxin nav danûstandina bi zar û gotinê. Hizir û ramanên kesên dîtir ji bo van kesan gelek giring in û her dem dixwazin ji aliyê hinekan ve bêne qebûlkirin û fikra hinekî dîtir li ser kiryarên xwe bizanibin û bèn ecibandin.

Ev kesên ha, ger dil hebe ku bi kesên dî re têkiliyê çêkin û bikevin nav kom û civatan jî ji ber ku ev hunera têkilîdayîna wan tune ye di xwe re nabînin bi têkiliyeke weha rabin.

Sedemên vê nesaxiya kesayetê şermende ji hindê çêbûye, dê-bavê wan ew bi awayekî nerast mezin kirine, di dema mezinbûn û gewdebûnê de her dem rexne li van kesan bûye û hemberî wan helwesta redkirinê, parastinê û rêya asaniyê hatiye kirin lewre jî xwe ji têkilîdayîneke tekûz didin paş û ew bi demê re kovî bûne. Li ser vê mijarê lêkolîn hatine kirin lê hêj ti sedemên esehî tespît nebûne. Agahiyên zayendî û malbatî di vê mijarê de ron û zelal nîn in.

Ew kesên ha, xwe bi tenê, dilşikestî û bêçare hîs dikin. Her dem wisa difikirin ku kesên li derdora wan ji wan çêtir, jîrtir, jêhatîtir û xweşkottir in. Ev kesên ha, tu carî aliyên xwe yên serkeftî nabînin û her dem dilê wan bi waswas e ku kesên dîtir dê kêmasiyên wan ên herî biçûk bibînin û tinazên xwe bi wan bikin. Ev kesên weha, piranî dixwazin bi tena serê



xwe bin an jî tenê hevaleyê wan hebe. Baweriya wan bi xwe tune ye. Gava bi mirovan re têkiliyan çêdikin gelekî bi kelecane dibin, dest û piyên wan bi lertzê dikevin û rûyê wan sor dibe. Sosyal fobî û depresyon bi van kesan re çêdibe.

**Tedawî/Çareserî:** Ev kesên ha, her çendî gelekî pêdiviya wan pê hebe jî zû bi zû bo çareseriyê serî li psîkiyatrist an jî psîkologan nadin. Ji ber ku metirsiyên wan gelek in dibe tedawiya wan neçe serî. Dema terapiyê gava kêmasiyêke biçûk jî çêbibe ev kesên ha, zû bi zû xwe didin paş û ji rêyên çareseriyê digerin. Ancax ku ev kesên ha û şêwirmend û terapîstê wan bikaribin têkiliyê ser binemayê baweriyê çêkin ew dikarin terapiyê dewam bikin. Wek tedawî jî, hunerên wan ên sosyal dikarin bêne xurtkirin, bi rêbazên reftarên têkilîsaziyê tedawî dikare bête bipêşxistin. Ger nesaxiya van kesan gihîştibe asta fobî/tirsa sosyal wê demê pêwîst e tedawiya dermanan bête pêkanîn.

#### **Li gorî krîterên Daneyên DSM-IVê;**

Ev nesaxî di temenê gewdebûna zû de dest pê dibe û di şert û mercên cuda de peyda dibe, bi vê re ev kesên ha ji civakê veder dibin, bi hest û dilfînên xwe têr nîn in û li hemberî kawdanan zêde diltenik in.

Nîşaneyên vê nesaxiyê li jêrê bi çar (an jî zêdetir) nîşaneyan xuya dibe.

- Ev kesên ha, ditirsin rexne li wan bê girtin, ditirsin neyêne qebûlkirin û ditirsin bêne vederkirin lewre jî ew kes xwe ji aktîvîteyên pîşeyî ku bi ser têkiliyên pîrkesî çêdibin, didin paş.
- Heta ku yeqîn nebin têne hezkirinê ew kesên ha naxwazin bi mirovan re têkiliyan çêkin.
- Ji ber tirsê ku dê fihêt bibin an jî dê tinazên xwe bi wan bikin di têkiliyên nêzik de asê dibin, lalûte dibin.
- Di rewşên civakî de ditirsin ku ew bêne rexnekirin an jî paxav bi wan neyê kirinê.
- Ji ber hestên xwe yê kêma gava li derekê bi kesên nû re bimînin dest û lingên wan li hev dialin û bêhna wan ditengije.
- Ev kesên ha, xwe di warê civakî de bêtêr dibînin, wek kesayet xwe di rasta xelkê de kêma û daşkestî dibînin.
- Ji tirsê ku dê fihêt bibin ev kesên ha naxwazin hewldanên kesane bi pêş bixin an jî qet neyên beşdarî helkeftên cewawerî bibin.





# NEXWEŞIYA PERÎZADE (GUATR)

KOMA BÎYOLOJÎYA BI KURDÎ



Mirov îyotê di nav xurekan de werdigire. Gelekî xurek(adan) li xwe îyot digirin, lê di nav xurekên ji deryayê(behre) yên wekî keviz, masî, karîdes de zef îyot heye. Li gel vana, zerika hêkê, şîr, penêr, mast kartol,tûfiringî(çîlek) û mûz jî gelek îyot li xwe digirin. Bikaranîna xwêya biîyot jî rê li ber nexweşîya guatrê digire. Nexweşîya guatrê bi neştergerîyê çareser dibe.



Ji bo berdewamîya tendirustîya mirovan, pêdivî bi mînerala îyotê heye. Mirovek gihayî divê rojê bi qasê 145 mîkrogram îyot werbigire. Ji vî mêjerê kêmtir an jî zêdetira îyodê dibe sedema nexweşîyan.

Hormonên tîroksîn (T4) û tîrodotîronîn (T3) atomên îyotê li xwe digirin. Ango ji bo berhembûna van hormonên pêdivî bi îyotê heye. Eger asta rêjeya îyotê di nav xwînê de kêm be, wê gavê hormon çê nabin.

Gava di nav xwînê de rêjeya hormonên hîpofîzê kêm be, ji hîpotalamusê hormona derpirandinê ya rijênê tîroîd (Thyrotropin releasing hormone-TRH-) tên derdan. Ev hormon li ser hîpofîza pêş bandor dide ku ji hîpofîzê hormonek hander çê bike. Navê wê hormônê

jî hormona handerê rijênê tîroîd e (TSH). Armanca hormona TSHê rijênê tîroîd e. Bi bandora hormona TSH, tîrod dest bi berhemkirina hormonên tîroîdê dike. Ji boy berhembûna tîroksîn û tîrodotîronîn, li gel asîdên amînî, divê bi tîra xwe îyot jî hebe.

Di rewşa kêmiyotî de rijênê tîroîd bi tîra xwe hormon çê nake, vê gavê di nav xwînê de asta rêjeya hormonên tîroîdê kêm dibe. Gava ku hormonên tîroîdê kêm in hîpotalamus hê pirtir TRH der dide, ji ber bandora TRH, hîpofîza pêş jî hê pirtir TSH berhem dike û ber dide nav xwînê. Bi bandora TSH rijênê tîroîd hewl dide ku hê pirtir hormon berhem bike, lê ji ber kêmiyotî bi tîra xwe hormon berhem nabe. Her çiqas sedema berhemnekirina hormon ji kêmasîya îyotê be jî, ji tîroîdê wetrê xaneyên

wî kêm in loma bi tîra xwe hormon berhem nake. Ji ber vî sedemê xaneyên tîroîdê dabeş dibin û tîroîdê gir dîkin. Ji ber tîroîda girbûyî, di qirika mirov de girê çê dibe û qirik û gewrî diwerime. Ev rewş wekî perîzade (guatr) bi nav dibe. Nexweşîya guatr bi gelemperî ji ber kêmiyotî peyda dibe, lê hin caran hîpotîroîdîzm û hîpertîroîdîzm jî dibe sedema guatrê.


Mirov îyotê di nav xurekan de werdigire. Gelekî xurek(adan) li xwe îyot digirin, lê di nav xurekên ji deryayê(behre) yên wekî keviz, masî, karîdes de zef îyot heye. Li gel vana, zerika hêkê, şîr, penêr, mast kartol,tûfiringî(çîlek) û mûz jî gelek îyot li xwe digirin. Bikaranîna xwêya biîyot jî rê li ber nexweşîya guatrê digire. Nexweşîya guatrê bi neştergerîyê çareser dibe.

# MIROV ÇIMA Û ÇAWA TÎ DIBE?

KOMA BÎYOLOJÎYA BI KURDÎ



Gava xwîna mirov kênav dibe(tîr dibe), hin wergirên li nav lûleyên(demar) xwînê rewşa xwînê radigihînin hîpotalamusê . Hîpotalamus bi derdana hormona dijî mîztinê bandor li ser coyên mîzê yên nav gurçikan dike.




Navenda tîbûnê ya mêjîyê mirov hîpotalamus e. Eger mirov pir xwêdan bide, an jî xwarinên(xurek) şor an jî şîrîn bixwe wê gavê xwîna mirov tîr dibe. Her wisa nexweşîyên wek vîjîkî(virikî) ketin jî dibe sedema xwîna kênavî.

Hîpotalamus navenda parastina hevsengîyê ye, loma hewl dide ku tîrîya xwînê daxîne asta asayî. Ji boy ronkirina xwîna tîr, hîpotalamus hormona dijî mîztinê (ADH,Hormona antî diûrîtîk) berhem dike.

Hormona dijî mîztinê wekî hormona vazopresîn jî tê nasîn. Hormona vazopresîn li hîpofîze, di xaneyên demarî yên derdanî de berhem dibe. Her çiqaş xaneyên demarî di nav hîpotalamusê de cih digirin jî, aksonên xaneyên demarî yên derdanî hormona vazopresîn, der didin nav hîpofîzê. Hîpofîz rijênêk taybet e û ji du loban pêk tê. Hîpotalamus hormona dijî mîztinê(vazopresîn) di nav hîpofîza paş(loba paş) de enbar dike.

Gava xwîna mirov kênav dibe(tîr dibe), hin wergirên li nav lûleyên(demar) xwînê rewşa xwînê radigihînin hîpotalamusê . Hîpotalamus bi derdana hormona dijî mîztinê bandor li ser coyên mîzê yên nav gurçikan dike.

## Rêxistina Derdana Hormona ADH



Di demên asayî de gurçîk mîzê ji xwînê parzûn dike. Di nav mîzê de ure, amaonyak, hormon, vîtamîn, gelek cureyên xwê û hin madeyên bêkêr heye. Li gel van madeyan, mîz % 90-95 ji avê pêk tê. Lê dema xwîna mirov tîr dibe, vazeprosîna di nav hîpofîza paş de enbarkirî, bi alîkarîya xwînê

xwe digihîne gurçîkan, vê carê gurçîk disa wekî demên asayî, xwînê parzûn dikê. Lê gava mîz di coyên(luleyên) gurçîkan de ber bi mîzdankê diherike, hormona vazeprosîn dibe sedem ku hinek ava di nav mîzê ji aliyê xaneyên dîwarê coyê dubarê bînin mijandin. Ava dubare mijandî tevlê xwînê dibe. Bi

vî awayê xwîna tîr piçêk ron dibe. Mîz jî hinek tîr dibe.

Her wisa hormona dijî mîztînê(ADH) dibe sedema tîrbûna mirov jî. Bi vexwarina avê, rêjeya tîrbûna xwînê hê pirtir kêmtir dibe. Dema ku tîrbûna xwînê gihîşt asta asayî, derdana hormona dijî mîztînê jî radiweste.



# TEHTÊN BILIND ÇÎROK E YAN KURTEROMAN E?

■ LOKMAN POLAT



Pêşî ez vê bibêjim; pirtûkên Kurdî zû bi zû du car nayêne çapkirin. Pirtûkên Kurdî ên ku du car hatine çapkirin pir hindik in. Yê min, di nav 30 pirtûkên min de du pirtûkên min du car hatine çap kirin. Pirtûka birêz Mihemed Seîd Temel a bi navê "Tehtên Bilind" du car hatîye çap kirin. A ku ez niha dixwînim çapa duyem e.




Pirtûka birêz Kek Mihemed Seîd Temel a bi navê "Tehtên Bilind" di nav weşanên "Nûbihar"ê de, di sala 2017an de li Stenbolê derkefiye. Pirtûk 120 rûpel e. Li dawîya pirtûkê ferheng jî heye. Di ferhengê de maneya gelek peyvên Kurdî hene. Hinek peyvên Kurdî sînonîmên hev in. Peyv cuda bin jî maneya wan yek e. Peyvên hevmane wek du sê peyvên cuda werine bikaranîn, werine gotin jî maneya wan heman tişt e, eynî ye. Kurd gelek peyvên hevmane, yek mane bikar tînin. Ev jî dewlemendîya zimanê Kurdî ye. Wek mînak; wisa, wilo, bihîşt, cennet, bijîşk, doktor, çareser kirin, hel kirin, destûr, îcaze, îzîn, erdhej, zeleze, hêsan, rehet, maf, heq, oldar, dîndar û hwd.

Mijara pirtûkê derbarê jîyana civakî a Kurdan ya salên çûyî, salên derbasbûyî, salên 60-70 sal berê û di wan salan de jîyana bi êş û zehmet ku çawa hatibû jîyîn tîne zimên. Di wan salan de rewşa eşîrên Kurd ên herêma Bişêrîyê,

bi hevdu re şer û pevçûnên wan, têkilîyên eşîrên serxetê û binxetê tê qalkirin.

Serxet û binxet ji bo du perçeyên Kurdistanê tê gotin, tê nav kirin. Serxet bakurê Kurdistanê û binxet jî rojavayê Kurdistanê ye. Di navberê de hidûd ango sînorê sunî ê dewletên dagirker heye. Li sînor, di ser sînor de bi dizî qaçaxgerî tê kirin. Hinek Kurd ji bo debara mala xwe, ji bo jîyana malbata xwe, ji bo aborîyê qaçaxvanî dikin. Qaçaxcîfî karekî gelek zahmet e, xetere ye, bi zor û zahmet bi tirs dikat kirin. Gelek qaçaxger li ser sînor, di hidud de bi pevçûna şerê navbera wan û leşkerên dagirker de dihatin kuştin, gelek qaçaxger pêl li mayinan dikir; dimiriyan an jî seqet diman, dest, çeng û lingên wan jê dibû.

Gelo pirtûka Mihemed Seîd Temel a bi navê "Tehtên Bilind" çîrok e yan kurteroman e? Dema min pirtûkê girt destê xwe ku bixwînim, min mêze kir li ser berga pêşî a pirtûkê yan jî li rûpela hundir a



destpêkê de nenivîsîna ku ev pirtûk roman e yan çîrok e? Min jî meraq kir, gelo ev roman e yan çîrok e? Ji bo ez bizanibim ka pirtûk di kîjan kategorîya edebîyatê de ye, divê ez pirtûkê hemû bixwînim û li gor zanîna xwe bi nav bikim, ka pirtûk çî ye?

Pêşî ez vê bibêjim; pirtûkên Kurdî zû bi zû du car nayêne çapkirin. Pirtûkên Kurdî ên ku du car hatine çapkirin pir hindik in. Yê min, di nav 30 pirtûkên min de du pirtûkên min du car hatine çap kirin. Pirtûka birêz Mihemed Seîd Temel a bi navê "Tehtên Bilind" du car hatîye çap kirin. A ku ez niha dixwînim çapa duyem e.

Di encama xwendina min a pirtûkê de bersiva ku ez bidimê ev e ku ka pirtûk çî ye? Dema min xwendina pirtûkê qedand min nêrî ku di perga paş de "hîkaye" nivîsîna. Yanê li gor nivîskar û weşanxaneyê pirtûk "hîkaye" ye. Dîyar e weşanxane di şûna peyva çîrokê de peyva hîkaye bikar tîne. Lêbelê li gor min pirtûk; pirtûkek çîrok/hîkaye nîne. Li gor zanîna min "Tehtên Bilind" roman jî nîne û çîrok/hîkaye jî nîne. "Tehtên Bilind" kurteroman e.

Wisane, kurteroman çî ye? Cudabûna kurteromanê ji çîrokê û romanê çî ye? Di edebîyata Kurdî de kîjan berhem dikevin nav kategorîya kurteromanê? Ez ê bi kurtahî bersîvên van pirsan bidim.

Ez ê terfa kurteromanê wiha bikim, kurteroman; ji romanê kintir û ji çîrokê dirêjtir e. Naveroka kurteromanê ji çîrokê firehtir û ji romanê tengtir e.

Kurteroman ji çîrok û romanê cuda ye. Cudabûnên kurteromanê di gelek waran de heye. Cudabûna bingehîn teknîka nivîsîna ye. Teknîka nivîsîna kurteromanê ne wek çîrokê û ne wek romanê ye. Teknîkekî bi serê xwe ye, orjînal e. Ev teknîk teknîkeke modern e. Di edebîyatê de, di nivîsîna berhemên edebî de, teknîka herî dawî û nûjen e. Nivîskarên hevdem vê teknîkê bikar tînin. Yê ku vê teknîkê bikar tînin, piranî nivîskarên Ewropî ne û hinek nivîskarên Latîn Emerîkî, Japonî û Rusî ne. Di nav nivîskarên Kurdan de yê ku vê teknîkê bikar anîne; Bavê Nazê, Hesenê Metê û ez –Lokman Polat- im.

Hesenê Metê vê teknîkê di berhemên xwe ên bi navê "Labîrenta Cinan" û "Tofanê" de, Bavê Nazê di berhema xwe ya bi navê "Stockholm Te Çi Dîtiye Bibêj" de, û min jî di berhema xwe ya bi navê "Ro-jnamevan" û "Nûrheyata Licê" de pêk anîye.

Di hêla taswîra xwezayê –naturê-, însanan, bûyeran û hwd. de jî di nav roman, çîrok û kurteromanê de cudabûn heye. Di romaneke mezin û berfireh de kes, leheng, fîgur gelek in, qelebalix in. Di kurteromanê de hindik in. Di çîrokê de tunebin jî dibe, lê piranî yek,

du, sê kes in. Di romanê de bûyer pir alî ne, berfireh in. Her beşek, bûyereke romaneke mezin bi serê xwe dikare bibe kurteromanek. Lê, dema ew hemû beş û bûyer li hev hev rêz bibin û di nav wan de hevûdu girêdan pêk tê, dibe romaneke mezin, ango qalind.

Nivîskarê navdar Gabriel García Marquez gelek romanên mezin nivîsîye û weşandîye. Lê, wî ji bo berhemeke xwe gotîye "ev kurteroman e." Yanî wî berhema xwe wek roman na, lê wek kurteroman bi nav kirîye. Ev jî dide xuyakirin ku, divê mirov ferqiyetek têxe nav roman û kurteromanê.

Gelek nivîskarên Latîn Amerîkî û Ewropî kurteroman nivîsîne. Bi taybetî jî kurteromanên nivîskarên Îtalî navûdeng dane û li gelek zimanên cîhanê hatine wergerandin. Wek mînak; romana nivîskarê Îtalî Alessandro Baricco "Hevrîşim" (bi tirkî "İpek") kurteromanek gelek xweş e. Ev kurteroman, kurteromana lêgerîna bextiyarîyê ye. "Tehtên Bilind" jî kurteromaneke lêgerîna evînê ye. Li gor min "Tehtên Bilind" kurteroman e, lewre nivîskarê pirtûkê, berhema xwe bi stîla vegotina hunera kurteromanê afirandîye û honaka pirtûkê pêk anîye. Lewre jî divê di çapa sêyem a pirtûkê de li ser berga pirtûkê bê nivîsîn ku kurteromane.

Mînakek din a kurteromanê jî kurteromana nivîskarê Latînamerîkî –Kolombîyayî- Gabriel Garcia Marquez "Erêndira Dilpak" e. Nivîskar vê kurteromana xwe li gor şeweya surrealîzmê nivîsîye. Kurteroman 68 rûpel e. Di vê kurteromanê de serpêhatîya Erêndira dilpak û dapîra wê ya bêînsaf heye. Nivîskar di kesayetiya leheng û figurên kurteromanê de kesayetiya saffî û xirabîyê, evîn û nefretê anîye zimên.

Niha em li naveroka "Tehtên Bilind" binêrin. Dayika Zerê a jinebî, mêrê wê di şerê nav eşîran de hatîye kuştin. Ji bo kurê wê neyê kuştin wî dide koçeran. Zerê kurikek Ermenî jî ji kuştinê xilas kirîye û wî wekî ewladê xwe xwedî kirîye. Zerê kurê xwe Hesên û kurikê bavfileh ku navî danîne Elî, herduyan dide koçeran. Zerê ji mezinê êla koçeran Xalê Xidir re tembîh dike ku ew nebêjin Hesên û Elî ji eşîra Bişêriyê ne.

"Tehtên Bilind" kurteromaneke li gor pîvanên realîzma civakî hatîye afirandin. Nivîskarê Kurd M. Seîd Temel di pirtûkê de, jîyana koçerîyê û rewşa koçeran bi awayekî realîst anîye zimên. Zimanê nivîskar ku di pirtûkê de bi kar anîye zimanekî edebî, baş, zelal û herîkbar e. Li hevûdu hunandina beşan û ravekirina bûyeran jî bi hunerî ye, serketî ye.

Hizna Xatûn keçek a bedew e, spehî ye. Ew keça Temir Axa ye. Dilê wê û Hesên dikeve hevûdu, ew dibine evîndarên hev û bûyer dest pê dikin.

Di dema berê de, di nav Kurdan de edet, tore û tradîsyoneke nebaş hebû. Hinek Kurdên niştetih xwe li ser koçeran mezin didîtin û koçeran piçûk didîtin.

Wan keçên xwe nedidan Kurdên koçer û keçên wan ji kurên xwe re nedianîyan. Keç û xortên koçeran bi hevûdu re dizewicîn. Kurdên Êzîdî jî wiha ne, ji derveyê xwe keç naynin û keçên xwe nadine derve. Lewre jî Kurdên Êzîdî û Kurdên koçer wek Kurdên xas, Kurdên esil mane. Kurdên din gelek bi keç û xortên Tirkan re, Erebb re, Çerkez re, Azerî re û herwiha bi gelek bîyanîyên curbecur re zewicîne û zarokên wan jî melez in.

"Tehtên Bilind" kurteromaneke evînîyê ye. Mijara kurteromanê evîna Hizna Xatûn û Hesên e. Evîna Hesên di dilê Hizna Xatûnê de birîneke kûr vekirîye. Bavê Hizna Xatûnê, Temir Axa ji vê evînê bêxeber e. Gelo dê dawîya evînê bibe çî? Gelo dê evîndar bigîjin miradê xwe?

Jîyana koçerîyê jîyaneke zor û zahmete, lêbelê jîyaneke azade. Koçer di nav xwezayê/naturê/ de dijîn. Ew li deşt û zozanan digerin, li çîyan lîs dibin. Vebêj di pirtûkê de digel zahmetîya koçerîyê, xweşîya jîyana koçerîyê jî bi zimanekî edebî tîne zimên û raveyê xwendevanan dike.

Temir Axa bi evîna keça xwe Hizna Xatûnê dihese û ew fêr dibe ku Hesên koçer nîne, ew ji eşîra Bişêriyê ye.

Rojeke leşkerên dagirker tîne zarokên koçeran dicivînin û dibine leşkerîyê. Hesên jî bi xortên koçeran re dibin. Elî direve û leşker ji paşve gule berdidinê û wî dikujin. Zarokên koçeran sê sal leşkerî dikin. Piştî sê salan hemû xortên koçer vedigerin tîne lêbelê Hesên nayê û tu xeberek jê dernakeve.

Hizna Xatûn û malbata Hesên gelek xemgîn dibin. Evîndara wî Hizna Xatûn li pey evîna xwe diçe. Ew bi hêviya ku Hesên bibîne bi du qewraşên xwe ve diçe bajarê ku Hesên lê leşker bûye. Ew bi lêpîrsînê, di encamê de Hesên dibîne.

Gelo çima Hesên piştê ku tezkera leşkerî wergirtîye û herwiha leşkerîyê qedandîye çima venegerîyaye û nehatîye? Gelo piştê leşkerîyê çî bi serê Hesên de hatîye? Gelo çima evîna Hizna Xatûn û Hesên naçe serî? Çima ew nagîjin miradê xwe?

Bersîva van pîrsan di beşa dawî a kurteromanê de ye. Beşa dawî a kurteromanê bi êş e, trajedî ye. Trajedîya evîna Hesên, Hesênê ku jîyana wî li Bişêriyê dest pê dike, li Berîya jêrîn evîna wî şewq dide, li welatê xerîb ê nenas dawî dibe.

Pirtûka nivîskarê Kurd birêz Kek Mihemed Seîd Temel a bi navê "Tehtên Bilind" berhemeke hêjayê xwendinê ye. Divê xwendevanên Kurd vê berhema hêja bixwînin.



# XERABREŞK

## PERESTGEHA HERÎ KEVNAR A CÎHANÊ

XERZÎ XERZAN



Perestgeha Xerabreşkê berê deh salan ji hêla cotkarekî ve birasthatinî hatîye dîtin. Berhemeke bêhempa, keşfeke mezin û hêja...Xerabreşka perestgeha herî mezin û kevnare a mirovahîyê ji nav sinorên Rihayê bang li me dike û dibêje: “Şaristanî li vira ye.”



Ger bête fikirkirin ku pîramîdên Misirê çar hezar salî ye û Stonehenge- yê Brîtanyayê pênc hezar salî ne, divê bête pejirandin û li seranserê dinyayê jî divê wiha bête zanîn, ev kolan kolana arkeolojîk a herî giring a dinyayê ye a ku heta îro hatîye pêkanîn.

Mezopotamya: Bêgengeşî tê pejirandin ku dergûşa şaristanîyan e. Her wiha cihê axên taybet û pîroz ê şaristanîyan e ku cara yekem mirov li vir dest bi çalakîyên xwe yê şarezahî kirine. Dibe ku îsbata herî giring a vê tezê jî perestgeha antîk a Xerabreşkê be.

Perestgeha Xerabreşkê berê deh salan ji hêla cotkarekî ve birasthatinî hatîye dîtin. Berhemeke bêhempa, keşfeke mezin û hêja...Xerabreşka perestgeha herî mezin û kevnare a mirovahîyê ji nav sinorên Rihayê bang li me dike û dibêje: “Şaristanî li vira ye.”

Giringîya vê herêmê ku firehîya wê neh hektar e û di sala 1963an de hatîye dîtin berîya deh salan bi

saya cotkarekî ku zevîya xwe cot dikir ve hatîye fêhmkirin.


Tê de bermahîyên mîmarî yê warên merasîman ji bo perestîne kêlan, kevirên çik ên li ser rûyên wan resmên ajal û nebatan hatine xêzkirin ku kevnariyên wan digihîje B.Z. 11 hezar salan. Giringîya herême jî ev e ku ev herêm xwedîyê warê perestîne yê herî mezin e.

Anegorî dîtinan û lêkolînên ku heta îro hatine kirin pispor digotin ku mirovên dewra “kevirê sîqalkirî” nîkaribûne ajalên hawirdora xwe kedî bikin. Giringî û taybetîya Xerabreşkê ku perestgeha wê dewrê ye jixwe li vira dertê meydanê û hêjabûna xwe wisa radigihîne.

Ji bo giringîya Xerabreşkê tam bê fêhm kirin divê em guh bidin arkeologê Elman Dr. Klaus Schmidtê berpirsyarê vê lêkolînê;

“Bi saya keşfê destkeftîyên Xerabreşkê, me berê de pê derxistibû ku li seranserê dinyayê yek ji wan perestgehên herî kevnar di





vê herêmê de ye. Lê bi lêkolînên dawî, me piştrast kir ku ev perestgeh, perestgeha herî mezina dinyayê ye. Anegorî lêkolînên me, dîtin û nêrînên me yên derbarê resmên belkîrî yên dewarê kûvî, dûpişk, rovî, mar, şêr, kerê kûvî, werdekê kûvî û nebatên kevnare de em têgihîştin ku mirovên di dewra kevirê sîqalkirî da jîyîne; nikaribûne ajalên xwe kedî bikin. Ya din jî; resmên belkîrî yên li ser rûyên stûn û kêlan (Stêl), di derbarê hunerên mirovên di wê dewrê da jîyane fikir didine me. Ev perestgeh, bi taybetmendîya xwe ya bûyîna perestgeha herî kevnar a dinyayê ciheke taybet di nav xwe de dihevine. "

Xerabreşk, yek ji wan keşfên herî mezina a di warê arkeolojîyê de ye. Lewre mîna yekem a civakên komkar-nêçîrvanan e ku ew kom di wê demê de hîn jî derbasê jîyana bajarîyan nebûne lê balkêş e perestgehan ava kirine. Û ev rastî di warê dîroka şaristanî û bajarîyê da keşfeke wisa ye ku berê nehatîye dîtin. Heta xwediyê lêkolînê Dr. Klaus Schmidt gotîye; "Pêşî perestgeh hat dû re jî bajar hat" û li gel vê hevoka xwe di warê dîroka şaristanîya kevnare de nêrîneke nûjen û balkêş afirandîye.

Xerabreşk, ji hêla gelek lêkolîneran ve weke "Baxçeya Edenê" tê qebûlîkirin ku navê wê di

kitêbên pîroz de derbas dibe û bi vê taybetmendîya xwe ew baxçe dibe mijara lêkolînên cuda. Bi rastî ne tiştî pir balkêş e ku Zevîya Edenê ya Adem û Hewa tê de jîyane di yek ji wan bihuştên Mezopotamyayê de cih bigire lewre navê vê herêmê Mezopotamya ye yanê "dergûşa şaristanîyan"e.

Keşfa herî giring ji bo peyitandîna Xerabreşk ku perestgeha herî mezina û kevnara a dinyayê ye jî peykereke olî yê 11 hezar salî ye. Lebata nêrî di destên peykerê de ye û ev di dewra antîk de nîşana berdarî û bereketê ye. Di stûyê peykerê de nîşana tîrê heye û tîpa yekem a alfabeyê "A" jî xwe xweş nîşan dide. Ev jî piştrast dike ku ev peyker wekî Xwedayê berdarîyê an jî bereketê hatîye pênasekirin. Lewre ev her sê nîşan jî di dewrên antîk de weke îşaretên bereketê û hêzê tînan zani.

Xerabreşk keşfeke gelek girîng û taybet e. Bi taybetî ji bo gelên Kurdistanê û Mezopotamyayê. Di van demên dawî de li gel keşfên weke Xerabreşk, Kexê û Tilên angaşten nû dertên holê û ew angaşten vê rastîyê diparêzin: "Şaristanî ji axa bakûrê Mezopotamyayê an ku ji Kurdistanê li seranserê dinyayê belav bûye"

Û ev rastîyek e ku ti carî tu kes nikare betal bike!



# SÎNEMAYEKE DERENGMAYÎ SÎNEMAYA KURDÎ

MÛRAD CANGO



Di sedsala 21emîn de Sînemaya Kurdi ketîye di nava tevgerek nû û girîng. Di destpêka sedsalê de berhemên herî baş ên nû hatine afirandin.

Bi taybetî jî di vê sedsalê de derhênerê herî bi nav û deng, bi filmên xwe deng bi cîhanê vedaye û Kurdan bi dinyayê daye nas kirin Behmen Qubadî ye. Di filmên xwe de gerek ji hêla ziman ve û gerek jî, ji hêla çand û jîyana Kurdan ve mijarên baş ên xurt derxistîye pêş. Behmen Qubadî Sînemaya Kurdi wek “jineke bi heml e, ji bo welidandina wê divê mirov bibe alikar” dîtîye.



Sînemaya Kurdi cara yekemîn di sala 1926an de li Ermenistanê bi filma “Zarê” dest pê kirîye. Lê mirov ku sala 2000an bi filma Behman Qubadî “Dema Hespên Serxweş” ê ku di Mihricana Filmên Cannesê de Xelata Qameraya Zêr girtîye, dikare ji bo Sînemaya Kurdi mîlad bide nîşan. Di sala 2006an de jî bi pêş ketîye.

Di dawîya sedsala 20emîn de di Sînemaya Kurdi de berhemên nû hatine afirandin. Ji wî demê heta îro gelek filmên ku mijara wan Kurd in hatine kişandin. Lê mijara wan filman her çiqas ku Kurd bin jî, zimanê filman ne bi Kurdi ye. Ew film bi piranî bi zimanê Tirkî hatine kişandin. Sedema vî yekê jî ew e ku zimanê Kurdi hatîye qedexeyê kirin û tu berhem bi vî zimanê nehatine dayin. Ji ber wê qedexekirinê jî, mirov dikare bibêje ku pêşeroja Sînemaya Kurdi li Tirkîyeyê digihêje sala 1980an. Li gor hinek agahîyan ev yek bi saya Yılmaz Guney çêbûye. Weke ku me li jor jî qala Sînemaya Kurdi kir, her çiqas ku mijar di derheqên Kurdan de be jî, lê mixabin zimane ku bikar tê zimanê serdest Tirkî ye. Filmên Yılmaz Guney jî di vî xakê de gotinên min xurt dike.

Di sala 1982an de di Mihricana Filmên Cannesê de bi filmên “Rê” û “Kerî” xelat girtîye. Zimanê filmên Yılmaz Guney her ku bi Kurdi nebin jî, ji hêla çandî, kevneşopî, rêbazên dîtbarî ve ji bo nasîn û naskirina gelê Kurd berhemên sereke ne.

Di sedsala 21emîn de Sînemaya Kurdi ketîye di nava tevgerek nû û girîng. Di destpêka sedsalê de berhemên herî baş ên nû hatine afirandin. Bi taybetî jî di vê sedsalê de derhênerê herî bi nav û deng, bi filmên xwe deng bi cîhanê vedaye û Kurdan bi dinyayê daye nas kirin Behmen Qubadî ye. Di filmên xwe de gerek ji hêla ziman ve û gerek jî, ji hêla çand û jîyana Kurdan ve mijarên baş ên xurt derxistîye pêş. Behmen Qubadî Sînemaya Kurdi wek “jineke bi heml e, ji bo welidandina wê divê mirov bibe alikar” dîtîye.





Di diroka Sinemayê de Kurd bi piranî nebûne xwedîyê sînemayek. Di filmên dinê de jî gelê Kurd wek mirovên hov, nedîtî, cahil, nexwendî, afirînerên kevneşopîyên feodal, xwedîyê şerên giran û hwd. hatine nişandan. Lê rastî ne wisa ye. Mirov dikare bibêje ku Kurd di berxwedanan de, di têkoşinan de bûne aferînerên jîyanekî mezin û xurt. Di vê xakê de ji bo ku gotinên me xurt bike, em dikarin Xelîl Ūysal (Halil Uysal) wek mînak nişan bidin. Xelîl Ūysal bi filmên kişandîye daye nişan ku, gelê Kurd gelekî cahil û hov nîne û herwiha xwedî rê û rêbazên medenî ne. Di şûna vî ramanê de, di hişên mirovan de profilêk nû afirandîye. Ev profil jî, ji bo mafê mirovahîyê her tim li hember zordestan gelê Kurd ger di qadan de ger jî li çîya berxwedanan didomîne. Di filmên “Bêrîtan, Eyna Bejnê, Dema Jin Hez Bike, Tîrêj” de berxwedana gel li ber çavan raxistîye.

Ji hêlek din ve li dû Behmen Qubadî, mirov dikare qala derhênerêkî nûjen Hiner Salim bike. Filmên wî yên wek “Vodka Lemon, Kilometre Zero û Dol” deng vedane. Di sala 1992an de piştî şerên kendawê jîyana Kurdên başûr kişandîye. Filmên wî di Mihricana Filmên Venedîkê de hatîye nişandan. Fîlma xwe yê yekemîn ‘Vive la marie et la liberation du Kurdistan’ di sala 1998an de tamam kirîye. Di sala 2000 an de fîlma xwe ya duyemîn ‘Passeurs de rêves’ danîşan daye. Fîlma wî ya sêyemîn “Vodka Lemon” di sala 2003an de di Mihricana Filmên Venedîkê de “Xelata San Marco” girtîye. Di sala 2005an de jî, ji Wezîrê Çanda Fransî, Renaud Donnedieu de Vabres, pênasîya Chevalier des Arts et Lettres girtîye. Ji bo her du filmên xwe yên dawî “Kilometre Zero” û “Dol” vegeşîya welatê xwe.

Piştî ev çend agahîyan mirov dikare bibêje ku ev sedsal, sedsala Kurdan e. Ji her alîye ve dewlemendî her ku diçe zêdetir dibe. Yek ji wan pêşveçûnên Kurdan ew e ku êdî Kurd jî di sinemaya cîhanê de êdî dibine xwedî reng, deng û karakterên nû. Ji hêleke din ve jî Kurd êdî bi hemû hebûnên xwe derdikevine sehneyê. Ji hêlek ve jî êdî Kurd bi zimanê xwe di Sînemaya Cîhanê de roleke mezin digirin û ya herî giring jî bi her zaravayên Kurdî film têne kişandin.

Îro Sînemaya Kurdî hem ji hêla gelên Tirkîyeyê ve hem jî, ji hêla dinyayê ve tê meraq kirin. Ū jimara filmên Kurd û Kurdî her ku diçe zêdetir dibin. Li Tirkîyeyê jî Kurd û zimanê wan demekî dirêj hatibû qedexe kirin. Her çi qas sedemekê wiha neyînî hebe jî, Kurdan bi salan bi filmên Yılmaz Guney hêz dane sînemaya Tirkîyê. Lê ji vir şûnve wê êdî ew film û cîhana xwe wek “Sînemaya Kurdî” bi nav bikin û ji xwe re sînemayeke cuda û alternatîf biafirînin. Li pêşîya Sînemaya Kurdî hêj gelek çîrok û mijar hene.

# ^SÎNEMAYA BÊWELAT^ SÎNEMAYA KURDÎ

■ DILAZAD ART | dilazadart@gmail.com



Di filmên Tirkî de, Kurd wek fîgurekî folklorik bikaranîne. Kurd wek kesên nezan û paşverû nîşandane. Filmên ku mijarên civakî nîşandidan jî –Berdel, Züğürt Ağa, Güneş Yolculuk- jî rolekî ku Kurdan kêr dibîne û ji hêla rastîya sînemaya ve ku çewte nîşan daye. Ya sosret derhênerên Kurd jî ji vê çemberê derneketine.

Mêrdîn  
Ençere  
2017



Ji bo ku em sînemaya Kurdî fêm bikin divê pêşî em sînemaya Tirkîyê, Îranê, Iraqê, Sûriye û Sovyetê (Ermenistanê) baş binasin. Bi taybetî sînemaya Tirkîyê dibê baş were nas kirin. Ji ber ku Kurd di sînemaya Tirkîyeyê de bi mijar û coğrafyaya xwe cihekî gelekî girîng digirin. Li her çar dewletan Kurdî qedexeyê bû. Ji ber vîna jî mînakên pêşî yên sînemaya Kurdî li Ermenistanê hatine avêtin. Piştî filmê Grass yê dokumenterî, filmên pêşî ku li ser Kurdan hatîye kişandin bêguman filmê Zarê ye. Ev film li Ermenistanê hatîye kişandin. Fîlm ji bo ku filmekî bêdeng e, ku wî zemanî hê filmên bideng nebûn, ji xwe ziman tê de nîne. Lê mijar û erdnîgarî ya Kurdan e. Kurdên ku li nav axa Ermenistanê de dijîn.

Ji xwe di hêla edebîyat û folklorê Kurdî de jî Ermenistan cihekî taybet digire. Her ku çawa romana Kurdî a bi rêk û pêk ya pêşî li Ermenistanê ji alîye Erebê Şemo (romana Şivanê Kurmanca sala 1935an) ve hatîye nivîsîn, filmê pêşî ye bi rêk û pêk yê Kurdî ji li Ermenistanê ji alîye Hamo Beknazaryan, ku Ermenî ye, hatîye kişandin.

Ji bo Kurdan, sînemaya Tirkî di dîroka sînemaya Kurdî de cihekî gelekî girîng digire. Dema bi awayekî lêkolînî em li sînemaya Tirkî binêrin, wê demê em ê bibînin ku ji sedî şeş mijara filmên Tirkî, mijarên li ser Kurdan e. Bi taybetî her filmê ku jîyana gund û gundîyan ji xwe re kirîye mijar ew bi awayekî sergirtî jîyana Kurdan vedibêje. Axaftina xwar û mar, cilên çiyayî, tevgerên dûrî şaristanîye tev bi awayekî sergirtî bahsa Kurdan dike. Lê ji sedemen qedexebûna Kurd û Kurdî ev film bi zimanê Tirkî hatine kişandin. Tişteki sosret ewe ku; ji bilî ziman di her asta filmên wiha de kesên ku dixebitîn Kurd bûn, mijar Kurd bûn û erdnîgarî jî Kurdistan bû.

Mesela filmên ku ser lîstikvanê wan Kemal Sunal in ku di nav gele Kurd de bi navê “Salako” tê naskirin, bi gelemperî filmên wî mijara xwe





ji jîyana Kurdan girtine. Heman taybetmendî ji bo filmên ku ser lîstikvan Şener Şen tê de dileyîze jî bi gelemperî mijara xwe ji Kurdî girtine. Her wilo hin filmên kesên ku di sînemaya Tirkî de gelek navdar in jî mijara Kurdî ji xwe re xistine senaryo. Di vir de Yılmaz Güney cihekî cûda digire. Güney di filmên xwe de navên karakterên xwe bi zanayî Kurdî danîne. Ev taybetmendî bi xwe ji bo sînemaya Kurdî cihekî cûda dide Güney. Bi taybetî di filma “Kerî” (nave wê yê orijînal bi Tirkî Sürü ye. 1978), Rê (Yol, 1982) ji bilî ziman her cûreyên taybetmendîya sînemaya Kurdî derxistîye pêş. Di pirtûka “Sed Derhenerên Sedsalê” de ji bo Güney, “derhênerê ku ji welatê xwe dûr mirîye” tê gotin. Di vê pirtûkê de Güney wek derhenerê Tirkî tê hesibandin. Ji xwe bêdewletbûna Kurdan li her deverê astengîyan derdixe pêş mirov. Di ve pirtûkê de sed derhenerên meşhûr yê cihanê têne nasandin. Tenê çav lazime ku bibîne.

Li Îranê sînemaya Kurdî piştî salên 2000an derket meydanê. Bi filmên Behmen Qubadî mirov ji filmên Kurdî yê ku ji Kurdistanê Îranê ne haydar bûn. Ya rast Qubadî hin filmên xwe li Kurdistanê Federal kişandine lê mijar jîyana Kurdên Îranê ye.

Li Iraqê û îro Kurdistanê Federal gelek filmên tene kişandin. Di dewra diktator Sedam de ji xwe her tiştê qedexê bû. Lê piştî ku Kurdistanê Iraqê federasyon bi dest xist, Kurdan gelek filmên kişandin.

Li Sûrîyê ji bilî çend filmên amator ji xwe navê sînemaya Kurdî nehatîye bilêvkirin. Di vir de dibe em Sînemaya Amudê bibîr bînin ku di vê sînemayê de nezikî 300 zarokên Kurd şewitîne. Têgeha Sînemaya Amudê di bin hişê mirovên Kurd de trawmayeke dilsoj hiştîye.

Yekem filmê ku li bajarên başûrê Kurdistanê hate nişandan vedigere dema Tîrmeha 1925an li Silemanîyê. Piştê di sala 1970yî de çend filmên ku filmên bi zimanê Farsî jî tê de hebûn anîbûn Kurdistanê û ew film bi jêrenivîsa Kurdî hatine pêşandan.

Sînemaya Kurdî li Iraq û Başûrê Kurdistanê, di dawîya salên 1980yî û destpêka salên 1990î de ji dayik bû. Guherîna û şoreşa medyaya deng û reng bi hatina video û weşana satalaytê, kontrol û sansûra dewletên despotik li ser belavkirin û çêkirina bernameyên TVyan bi dawî kir.

Di sala 1990î û di roja êrîşa Iraqê ya bi ser Kuweytê de filme Nêrgiz Bûka Kurdistanê, bi butçeya takekesî dest bi kar kir û li herêmên azadbûyî tamam bû. Derhênerê filmê Mekî Ebdula bê û mijara filmê derbarê helatina keçekê ji zewaca bidarî zorê bû û piştê dizanê ku hezkirîyê wê ji ber çalakîyên siyasî di girtîgehê de ye. Fîlm di sala 1993an de li çend welatên Ewrûpayê hete nişandan.

Mehdî Umêd 1990î de bi filmê Gorg û 1993an de bi filme Tonêl derket. Fîlmê Tonêl 17. Festîvala Fîlman a Gutenbergê de hate pêşkêşkirin.

Piştî serhildana bihara sala 1991an piraniya berhemên sînemayî kurtefilm û dokumenterên di derbarê komkujîya Helebçê û Enfalê de bûn, ku di asta navneteweyî de dengvedanake wisa nebûye. Lê gelek ciwanên Kurd ji derveyî welat vegeerîyan û dest xebatên sînemagerîyê kirin. Hiner Saleem, Mehdî Umêd, Ekrem Silêman, Enwer Sindî, Cano Rojbeyanî, Serbest Resûl, Semîr Ebdûk û hwd ku hin ji wan xwedî berhemên baş in.

Sînemaya Îranê dabeşî du qonaxan tê kirin, ku her qonax xwedî taybetmendîyên xwe ye. Di pêvajoya yekem de şûndestên sînemakarên Kurd, zêdetir weke babet û naverok derdikeve, her wisa bûyerên piraniya filman li ser xaka Kurdistanê qewimîne û bi wî awayî rengîniya siruştê Kurdistanê, hebûna pirsgerêkên civakî di filman de berbiçav in.

Hunermendê bi esil Kurd, Ebdulhuseyin Sipenta, di sala 1934an de filme Keça Lor çêdike. Piştê hunermendê bi navê Sîyemek Yasemî filmeke bi navê Lêvara Hêvîyê û Dalahu çêdike, ku qala jîyana sade ya gelên Loristan û Kurdistanê dike.

Wek dî Teymûr Patayî ku ji Sineya Kurdistanê Îranê ye di sala 1984an de dokumentarek bi navê Nan û Azadî kişandîye.

Pêvajoya yekem a sînamaya Îranê vedigere serdema desthilatdarîya malbata şahînsahî li Îranê, ku zimanê serdest zimanê Farsî bû û bikaranîna Kurdî di wê serdemê de qedexê bû. Ji ber wê jî filmekî bi zimanê Kurdî li Îranê çênebûye. Heta di serdema Komara Kurdistanê ya 1946an de jî û di serdema Musedîq de bi tenê berhemên ku ji alîyê bîyanîyan ve hatibine tomarkirin û heta niha hayê kesî ji wan nîne.



Di qonaxa duyem de, yanî qonaxa piştî şoreşa gelên Îranê û destpêka şerê Îran û Iraqê de ku ji sala 1979an dest pê dikê. Di wan salan de sînema weke emrazek ji bonî propagandaya şer bi kar dihat û di heman salan de filmê Oqabha/Baz bi derhênerîya Samuê Xaçîkîya û Duletû bi derhênerîya Rehîm Rehîmpûr bi zimanê Kurdî têne çêkirin. Naveroke filmê propagandaya ji bonî hezên Îranê di şerê li dijî Iraqê de ye.

Piştî hatina ser hukumetê ya Xatemî hinek azadî çêdibin û ev yek ji bonî derhêner û sînemagerên Kurdan jî dibe derfetek. Li Îranê li gor raporeke ne fermî ji %10 derhênerên filman Kurd in.

Di salên di navbera 1950 û 1964an de 54 film li Tirkîye hatine çêkirin. Piraniya çîroka wan filman nivîs û çîrokên nivîskarê bi eslê xwe Kurd Yaşar Kemal bûne.

Ji sedema qedexebûyîna Kurdî hunermendê Kurd Yeşar Kemal, Mûsa Enter, Yılmaz Guney û hwd ku mecbur bûne berhemên xwe bi zimanê Tirkî binivîsîn.

Sala 1975an de Memduh Ün filmê Efsaneya Çiyayê Agirîyê (Ağrı Dağı Efsanesi) çêdike, ku ev jî yek ji berhemên Yaşar Kemal e. Di sala 1992an filmê Mem û Zîn ji alîyê derhênerê Kurd, Umîd Elçî ve li Tirkîyeyê hate çêkirin. Zimanê eslî yê film Tirkî bû ku piştê ji bonî Kurdî hate dublajkirin. Derhêner Umîd Elçî di sala 1992an de bi filmê Mem û Zîn cara yekem têgeha Kurd xiste sînemaya Tirkîye de. Yeşim Ustaoglu di sala 1999î de bi filmê Güneşe Yolculuk (Rêvingîye Ber Bi Rojê Ve) pirsgirêka Kurd bi cesareteke sîyasî kişand.

Mesela Kurd û mijara şer û PKKê cara yekem ji hêla Reis Çelik ve di sala 1997an de bi filmê Işıklar Sönmesin (Ronî Venemirin) anî ziman.

Nêrîna desthilatdarîya Tirkîye li Kurdan ji bo piştaftinê bi awayekî erênî sînema her tim bikarani ye.

Di vê wateyê de, ya ku di warê sînemayê de rojavayîyan çî anîn sere Tirkîyê, Tirkîyê jî ev yek bi sere Kurdan de anîye. Gelên ku derveyî birdozîya fermî bûn bi gelemperî jî Kurd; hov, kevneperest û civaka ku her tim pê qurf/qerf werin kiran di sînemayê de bikaranîne.

Ku mirov qala têkilîyên sînemayê û dewletê bike, ev têkilî an rasterast an jî nerastere, yan xwe dispêre dewletê yan jî çavkanîya wê dewlet e. Sînema xwedîyê bergîyek berfireh e û ew zimanê xwe jî bi xwe çêdike.

Ji ber ku sînema bûye navgîna propagandayê ya herî girîng, 'huner' jî bûye xemla vê navgînê. Îro propangandaya piştaftinê ji çek û sîyasê zêdetir bi rêya sînema û hunerê tê kiran.

Di filmên Tirkî de, Kurd wek figûrê folklorik bikaranîne. Kurd wek kesên nezan û paşverû nîşandane. Filmên ku mijarên civakî nîşandidan jî –Berdel, Züğürt Ağa, Güneşe Yolculuk- jî rolekî ku Kurdan kêmbûnê û ji hêla rastîya sînemaye ve ku çewte nîşan daye. Ya sosret derhênerên Kurd jî ji vê çemberê derneketine.

Di dîroka sînemaya Sovyetê de an ku sînemaya Ermenistanê de her 10 salan de filmekî Kurdî hatîye kişandin. Destpêka wan filman jî serpêhatîya jinek Kurd, bi navê Zarê ye ku bi awayekî bêdeng hatîye çêkirin. Zarê wek yekemîn filmê Kurdan tê naskirin. Damezrênerê sînemaya Ermenistanê Hamo Beknazaryan di sala 1926an de dest bi çêkirina filmê Zarê kir. Senaryoya filmê ji alîyê Hakob Gazaryan û bi zimanê Kurdî hatîye nivisandin ku bi cara pêşîn elfabêya Kurdî li ser bingeha rênivîsa Ermenî ku ji alîyê rewşenbîrên wê demê ve hatibû amedekirin bi nivîsina vê senaryoyê bikar hatibû. Sala 1970yî deng li filme Zarê hatîye zêde kiran.

Di sala 1933yan de filmekî din bi navê Kurdên Êzidî hate ser ekranê. Film qala mamosteyêke bi navê Zînê dike ku rûbirûye kesên paşveruyên gund dibe. Di sala 1946 û 1959an de du filmên dokumentarî bi navên Kurdên Ermenistana Sovyetê û Kurdên Ermenistanê hatine çêkirin.

Film behsa guhertinên jîyana Kurdên li Ermenistanê yê piştî sosyalîzme ku çêbûne dike. Kurdên Ermenistanê; serkeftina Kurdên Ermenistanê yê di warên aborî, sîyasî û çandî de nîşan dide.

Di sala 1993yan de ku gelek rewşenbîrên Kurd û Ermen beşdar bûn, Studyoya Sînemaya Kurdî li Êrîvanê hate damezirandin.

Ji bo desthilatdarîya Sûrîyê gelê Kurd ji netewekî axa Sûrîyê qebûl nedikir, tu derfet neketin destê Kurdan de ku li Sûrîyê sînemayeke Kurdî ava bikin. Ya rast hêzekê mezin ya rewşenbîrên ku ji nav Kurdên Tirkîyê koçî Sûrîyê kiribûn ekoleke edebî li derdora kovara Haware avakirine. Lê ev rewş heta dema ku Sûrîye di bin desthilatdarîya Fransa de bû berde-





wam kirîye. Wek tê zanîn Sûrîyê heta sala 1946an di bin desthilatdarîya Fransa de bû. Piştî ku desthilatdarî kete destê Beasa Sûrîyê tev mafên Kurdan çî yênsî çî yênsî hiqûqî hatin binpêkirin. Ji van sedemên navborî sînemayeke Kurdî li Sûrîyê ava nebû.

Lê van salên dawî li gor agahîyên rojnameya Bûyer Pressê, Şîyar Ebdî cara yekem li Rojavayê Kurdistanê filmekî Kurdî li Kobanê kişand. Navê filmê Li Ser Rîya Heleb e.

Li dîsporayê an ku bi taybetî li Ewropayê ji bo derfetên azadî û derfetên aborî çend derhênerên Kurd yênsî ku filmên Kurdî kişandin derketin. Bêguman yênsî ku herî zêde tê naskirin Hiner Saleem e. Wek dî Hîşam Zaman, Miraz Bezar, Nizamettin Arîç, Jalal Janroy bi derfetên navborî film kişandine.

Sedema ku têgehên civakî û çandî tene nixandî jî 'bêdewletbûn' e. Ji ber civakên ku dewletên wan nîn in çanda wan jî ne sazûmankirîye.

Dema em behsa têgeha sînemaya Kurdî dikin, ev têgeh jî xwe ve derneketîye. Mîsoger xwe dis-

pêrê bingeheke dîrokî. Sînemaya Kurdî bi tunebûna sînemayek Kurdî re têkildar e gelo? Îro ne hebûn û tunebûna wê, sînemaya Kurdî çî ye tê axaftin.

Derhêner Cebrail Ebubekir ji bo dokumanteran wiha dibêjê; "Her sînemagerekî Kurd li her parçeyekî êş û trajedîyên ku bibin mijara filmê dokumanterekê kişandine." Di vê çarçoveyê de dokumenter ji bo êşên Kurdan yênsî dîrokî derxe meydanê girîng in.

Derhêner Aso Haji girîngîya filmên dokumenter tîne ziman; "Dîroka Kurdan her tim ji hêla kesên dî ve hatîye nivîsandin. Kurdan dîroka xwe nenivîsandin e. Her tim kesên dî bahsa Kurdan kir. Êdî Kurd gihîştin derfetan, filmên dokumenterî navgîneke ji bo windahîyên Kurdan yênsî di nav dîrokê de, ku wan derxe ser rûye erdê."

Wek encam em dibînin ku bi zêdebûna derfetên azadîyê rê sînemaya Kurdî jî ji bin sîya sînemaya Tirkîye, Iraq, Îran û Surîyeyê rizgar dibe û azadîya xwe îlan dike. Bi hêvîya ku sînemaya Kurdî bi navê welatê xwe, li ser navê Kurdistanê were temsîlkin.

## Çavkanî

Dêrsim Oremar, Kurtedîroka Sînemaya Kurdan, Kovara W, Dîyarbekir 2013, h. 45

Geoffrey Nowell-Simth, Dûnya Sînema Tarihi, wer: Ahmet Fethî, Kambalçı Yayınevi, İstanbul, 2008,

İbrahim Yıldırım, Wek Kardaşyek Neteweyî Sînema, wer. Abdûrrahman Bakir, Rewşen, Dîyarbekir, 2012, h. 6

A. Rahmî Kılıç, Kürt Sînemasi-na Bakmak, <http://www.ozgur-gundem.com/muhabir/193/a-rahmi-kilic> 15.05.2015

Bûyer Press, hejmar 01 r. 8 Weşana Kurdistanana Sûrîyê. 15.08.2014

Zeynel Dogan, ji röpörtaja Kovara W, h. 45

Yılmaz Tekin, Kürt Sînemasi mı Kürdistan Sînemasi Mı? <http://blog.radikal.com.tr/sinema-film-kritikleri/kurt-sinemasi-mi-Kurdistan-sinemasi-mi-21026> 01.04.2014

Önder Elaldı, Kürt sinemasi deneyimlerini paylasti, <http://ozgurgundem.biz/haber/73429/kurtsinemasi-deneyimlerini-paylasti> 21.04.2016



# TÊKOŞERİYA ÇANDÊ, TÊKOŞERİYA HERÎ SEXT Û DIJWAR E

AGIRÎ SORAN



Bi zimanên biyanî mirov dikare bibe lêkolînavanekî nîvco, mirov dikare bibe şîrovegereke cîhanî, mirov dikare bibe rexnegir an jî derbirînêreke baş lê mirov nikare bibe Kurd. Dema mirov nebû Kurd jî, sibê heyanî êvarê qala Kurd, Kurdistan û Kurdayetiyê bike tu sûda wê ji bo hebûna Kurdayetiyê tune. Ezmûna dîroka Kurdan ev yek wekî hebûna rojê piştrast kiriye.

Ji ber qelsbûna ziman, stran jî êdî qels in. Ji ber qelsbûna ziman berhemên wêjeyî jî êdî qels in. Ji ber qelsbûna ziman, jiyana Kurdewarî bi giştî qels e, kême, bêhêz e.



Jiyan di civat û civakên cîhanî da, asayî û li ser mijarên jiyana rojane birêve diçe. Ji ber vê yekê jî peyva “çand” û “hunerê” di wat-eyeke gelek cûda de tete şîrovekirinê. Çand wekî binemaya berheva wan civatan, huner jî wekî derhênerî, afirandêrî û jîrbûna kesên nava wê civakê tete dîtin û helsen-gandin.

Mixabin wekî gelek têgeh û peyvan, têgeha “çand” û “hunerê” jî, di zimanê Kurdî an jî bîr û boçûna Kurdî de bi awayekî gelekî cûda ji civakên dîtir, tete şîrovekirin û hizirandin.

Kevneşopeke me ya Kurdan heye. Wekî çavkaniya hemû hunera Kurdewarî, wekî çavkaniya pêşdebirina ziman û ramanê Kurdewarî, wekî bingeh û binemaya zanîn û têgihîştina Kurdayetiyê. Lê belê kêşe û arîşeya gihiştina mirovê Kurd ya vê kevneşopê heye. Pelên dîroka Kurdan, wekî pirtûkeke diriyayî, çiriyayî ji hev qut û di gelek deveran de jî ji hev dûr

in. Bo vê boneyê jî ew pira navbeyna dîrok an ku kevneşop û çanda Kurdewarî û derûnê mirovê Kurd yê îro niv hilweşiyaye. Her tim ev pir li ber helmata rûbarên dijwar li ber têkçûnê ye.

Çawan, her dar bi şitil ve dest bi avêtina re dike, li ser wê şitilbûnê şîrî tê, qûrmê xwe saxlem û qewim di nava axê de diçike. Rayê xwe di nava kurayiya axê de belav dike û li ser wê koka xwe bilind dike, qalind dibe, saxlem dibe; her mirovê li ser rûyê vê erdê jî bi heman rengî li ser koka xwe, li ser çanda xwe, li ser kevneşopiya xwe, li ser zimanê xwe, li ser zengîniyên dîroka xwe, xwe pê digihîne, xwe ava dike û xwe mezin dike.

(Dema mirov wekî gotar, an ku şîrove mijareke dinivîse, wekî çîrok tê, wekî lihevanîna peyvan dertê, lê belê ev rastî ew hinde rastiyeke sext û dijwar e, dikarim bibêjim girêka herî kor ya derûnê mirovê Kurd eve ye.) Eger em berdewam bikin; Ji bo piraniya mirovên Kurd





ev mijar ewhinde ne girîng e. Bêyî çanda Kurdî jî tête jiyandin. Bêyî zanebûna dîrokê, bêyî têgihîştin û pêgihîştina Kurdewarî jî mirov xwe dikarin wekî têkoşer, wekî pêşeng, wekî Kurdperwer bidin nasîn û bidin zanîn. Lê belê rewş ew hinde ne asane. Mirovê ji koka xwe, ji ziman û çanda xwe, ji zanebûna kevneşopa xwe bêpar û qût be, di kesayeta xwe, rewîşt û derûnê xwe, hizir û pergala têgihîştina xwe de mirovekî seqet, kêr û nîvco ye. Ew mirovana çiqaşî xwe di warê zanebûna teorî, şîrovekirinên siyasî, hêza girseyî, derfetên aborî û hwd. de bihêz û zana bibînin jî, ev rastî nayête guhertin û eve yasayek ji yasayên civakê ne.

Madem her mirov li ser koka xwe mirov e li ser kevneşop û berhema xwe ya çandî mirov e, wê demê jî kesên ji vêya bêpar, ne mirovên tekuz in û kêr in. Ev rewş di rewşa Kurdan de hê diwartir rastiya xwe li pêş çavê me disepîne.

Mirovekî bi zimanê xwe yê zikmakî an ku bi Kurdî nexwîne û nenivîse, an jî ne peyive dê çawan karibe haya xwe ji “Nesrîn” a Mihemed Şêxo hebe. Dê çawan haya xwe ji hestên helbestên dilşewatê welatê xwe Osman Sebrî hebe?

Mirovekî bi zimanê xwe yê zikmakî an ku bi Kurdî ne jî, dê çawan haya xwe ji Kerîm Kabanê Silêmanî, ji Behcet Yahyayê ku stranên klasîk yê tesewufî ji me re wekî bohatiyêke îlahî vedibêje hebe?

Mirovekî bi Kurdî ne jî, dê Mamoste Hejarê zimanê Kurdî, Farisî û Erebi wekî hev dizanî û bikar tanî, bi hezaran lêkolînên çandî û zimanî pêk anîne, xwedan ferhengeke qerase ya Kurdî-Kurdî-Farisî bi nave “Hembare Borîne” ye, binase? Mirovekî bi Kurdî ne jî, dê Mamoste Hêminê Mukrîyanî ji kî derê binase? Ew Hêminê ku zimanê çiyayên Kurdistanê diaxife û kul û kesera wan dikare vebêje.

Em hindekî dî rastiya kur vebêjin.

Ew mirovê bi Kurdî ne jî dê çawan karibe birîna dayikên wan zarokên Sînema Amûdê yê ku di nava gurên êgir de şewitîn têbigîhêje û li ser dermanê wê bibe xwedan hizir?

Ew mirovê bi Kurdî ne jî, dê çawan karibe şerpezetiya wan kulbarê rojhilatê Kurdistanê bizane, ewên ku him serma û seqema zivistanê, him erdên mayinkirî, him tava heyvê, him tîrêjên rojê dijminê wan.

Û bi hezaran mînakên wiha dikarim birêjim, vebêjim.

Di nava Kurdan de, qutbûna ji çand, wêje û zimanê xwe, qutbûna ji Kurdbûnê ye, Qutbûna ji mirovbûnê ye. Bi kurtayî bi laşê zindî mirin e.

Ji bo jiyankirina li ser koka xwe, girêdana çandî, kevneşopî ya Kurdewarî pêwîst e, lê belê ji bo gihîştina vê yekê jî ziman pêwîst e. Ew ben û werîsê qalind û qewî yê

mirov bi dîrokê ve girê dide, beriya her tiştî ziman e. Tenê bi zimanê Kurdî mirov dikare xwe binase, xwe têbigîhêje. Bi tu zimanêke dîtir mirov nikare gewher û navika hebûna Kurdewarî bijî.

Bi zimanên biyanî mirov dikare bibe lêkolîvanekî nîvco, mirov dikare bibe şîrovegereke cîhanî, mirov dikare bibe rexnegir an jî derbirînêreke baş lê mirov nikare bibe Kurd. Dema mirov nebû Kurd jî, sibê heyanaî êvarê qala Kurd, Kurdistan û Kurdayetiyê bike tu sûda wê ji bo hebûna Kurdayetiyê tune. Ezmûna dîroka Kurdan ev yek wekî hebûna rojê piştrast kiriye.

Ji ber qelsbûna ziman, stran jî êdî qels in. Ji ber qelsbûna ziman berhemên wêjeyî jî êdî qels in. Ji ber qelsbûna ziman, jiyana Kurdewarî bi giştî qels e, kêr e, bêhêz e.

Ji ber wê yekê jî bêyî mijarên berfireh yê çandî û hunerî hilgirimê dest, dikarim bibêjim, cihê ku desthilata siyasî, sazkar û dezgeh tune bin, mirov nikare gazinên xwe ji tu kesekî bike û kesekî ji bo xwe wekî pêşbend û asteng destnîşan bike. Her kesekî/e Kurd, çawan di ber evîn, hezkirin, ciwanî, bedewî, hest û hez û xwestekên xwe de berpirsiyar e, ew hinde jî di ber jiyankirina van bi zimanê Kurdî yê şêrîn, pêşdebirina wan bi hunera Kurdewarî berpirsiyar e.

Herkes tenê bi zimanê xwe dikare hunereke bêhempa biafirîne.

# XETEREYA SÎYASETÊ LI SER KURDÎ

AZAD SELEM



Eger hewldana hebûna zimanek hebe divê sîyasetek wê jî hebe. Bi saya sîyasetê, ziman xwedîyê sazîyan dibe û bi van sazîyan re mîna atmosfera ku giringîya wê ya jîyanî heye, ew çend li ser civata xwe rojek girîng dileyîze. Ziman, ji bo li hemû qadên civatê serdest be, divê cihêrengîya civata xwe di nav xwe de bihewîne. Her kes bi xwezayî ve nûnertîya zimanê civata xwe dike; lê ziman divê qet tu nûnertîya kesan, koman, partîyan an olan neke.



Çi di warê zanistiyê, çi di warê jîyana rojane de her tişt xwedîyê dualî ye. Mirov wekî ku tê zanîn dikare bi kêrê re kuştina kesan jî bike, dikare li mitbaxê karê xwe jî hêsantir bike. Sîyaset jî mîna kêrê xwedîyê dualiyê ye ku dikare zimanê Kurdî bikuje û wekî din dikare ji bo hebûna ziman derfetan jî biafirîne. Mixabin, ev her dualî jî li kar in.

Sîyaset, wekî têgehek, her çendîn tê wateya rêbazên rêvebertîya dewletan jî, di heman demê de di civatê de wekî helwestek an nêrînek jî tê dîtin. Her civat, kom, takekes dikare helwest û ramanên xwe wekî sîyasetek bide meşandin. Eger mirov ramanê xwe bi bingeha têkilîyên civatê xwe ve, bi pirsgerêkên neteweyê xwe ve ava bike û wekî hedefek li pêşîya xwe deyne hingî em dikarin bibêjin helwestek sîyasî jî dide meşandin. Le-

wre meşandina doza hebûna her tiştî bi xwezayî ve teşeyek sîyasî jî hildigire.

Di serdema îroyîn de mîna çand û ziman ger ku bi sazîyan re têkilî daneyne li ser civata xwe zêde bandorê nikare bike û dibe ku li pêşerojê jî tune bibe. Çimkî em dizanin pêşeroja ziman û çand bi rêya perwerdeyê çêdibe. Ev her du hêman ku stûna netewbûyinê ne, bi perwerdahiyê re tene hînkirin. Di nêzikahîya kevneşopiyê ya perwerdehîyê de malbat di warê veguhestina çand û zimanê de roleke girîng bi cih dianîn; lê îro her tişt bi sazîyên fermî tê meşandin û malbatan jî tenê peywira xwe ya ku ew sazî dîyar kirine bi cih tînin. Bi wateyek din, malbatên kevneşopî hinek xwedîyê xweserîyek bûn; lê îro ji dema bêhtir xwe bi sazîyên fermî gire dayîne û ji bo perwerdehîya nîfşên nû bi rêya teknolo-





jîyên ragihandinê yan jî rasterast bi beşdarbûna sazîyan re mîna amûrek ji bo serkeftîya armançên fermî tên bikaranîn. Ji zû ve têgeha zimanê zikmakî xwe radestî zimanê fermî kirîye. Em ji bîr nekin ku dayikên îro gelek ji wan xwedîyê dîplomeyên dibistanên fermî ne. Zimanê van dibistanan jî ne bi zimanê dayikê ne. Li her devera dinyayê ev tişt derbasdar e: Eger perwerde ne bi zimanê dayikê be, li wir sîyaseta pişaftinê tê meşandin. Sîyaseta pişaftinê jî ew çend çirkef e ku mîna rovîya li benda kozikê heta ku çîçekan hemû nexwe terkî wê derê nake. Ev bi wateya xwe ya resen ve sîyaseta dewleta pişaftinê ye. Xetereya rastêrast li dijî zimanê Kurdî ye. Lê xetereya sîyaseta ya Kurdîparêz jî

henin ku ev xetere çî bi hêz, çî bi sivik di dawî de derbeyek li ser serê Kurdî ye. Ev xetereya ku qasî sîyaseta pişaftinê ne berbiçav e, çî ye?

Eger hewldana hebûna zimanek hebe divê sîyasetek wê jî hebe. Bi saya sîyasetê, ziman xwedîyê sazîyan dibe û bi van sazîyan re mîna atmosfera ku giringîya wê ya jîyanî heye, ew çend li ser civata xwe rolek girîng dileyîze. Ziman, ji bo li hemû qadên civatê serdest be, divê cihêrengîya civata xwe di nav xwe de bihewîne. Her kes bi xwezayî ve nûnertîya zimanê civata xwe dike; lê ziman divê qet tu nûnertîya kesan, koman, partîyan an olan neke. Bêguman her kes bikaranîna ziman re xwedîyê vegotinek e. Her çend cihêrengîniya vegotinan zêde

be ew çend ziman bi pêş dikeve, ji alîyê huner, zanist û çand ve ew çend afirîner dibe. Wekî tê zanîn pekûtîya zimanê pişaftinê, ne tenê zimanên din; lê di heman demê de afirinerîya xwe jî dike. Ji loma sîyaseta ku Kurdî dimeşîne divê cihêrengîya nêrînan, olan binase. Divê kesek, partîyek ji bo sîyaseta xwe li ser hemû civatê serdest bike, Kurdî mîna amûrek bikar neyîne. Lewre Kurdî ji vegotinek wêdetir zimanek e, zimanê şaristanîyê ye û zimanekê dîrokî ye. Di nava domdarîya xwe ya dîrokî de bi raçavkirina guherîna civata xwe re heta îro hebûna xwe parastîye. Lewre hêza cudahîyê ya veguherînê ger piştgirîya pêşketinê nekiribaya zimanê Kurdî di têkilîyên nûjen de hebûna xwe nikaribû bidomanda.



# RAYEKA LÊKERAN ÇAWA TÊ BIDESTXISTIN?

BAWER AGIRÎ

“

Divê em bi bîr bixin ku rêbaza bidestxistina rayekan ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz eynî ye. Lê di hinek lêkeran de di dema niha de guherîna dengan diqewime.

16.02.2018



Lêker, bûyerekê, tevgerekê yan jî qewimînekê nîşanî me didin. Li cihê ku kar û tevgerekê hebe, teqez li wir lêker jî heye. Lêkerên ku nehatine kişandin giş navdêr in û mê ne. Her wiha rader in jî. Di Kurmancî de du rayek hene; rayeka dema niha û rayeka dema borî. Raderên Kurmancî du heb in; “-n” û “-in” in.

Em pêşî wekî mînak lêkera “*girtin*” hildin dest. Ev lêker gerguhêz e û niha di rewşa raderê de ye. Yanî nehatîye kişandin. Heke em raderê “-in”ê jê bavêjin “*girt*” li rastê dimîne. Ev jî rayeka dema borî ye. Lê heke em bixwazin rayeka wê ya dema niha bi dest bixin, îcar em ê tîpa “-r”yê ji rayeka dema borî

bavêjin. Îcar jî li ber destê me “*gir*” dimîne. Ev jî dibe rayeka dema niha. Em dîsa her du rayekan rêz bikin bibînin ka çawa ne.

-*girt*: rayeka dema borî.

-*gir*: rayeka dema niha.

Divê em bi bîr bixin ku rêbaza bidestxistina rayekan ji bo lêkerên gerguhêz û negerguhêz eynî ye. Lê di hinek lêkeran de di dema niha de guherîna dengan diqewime. Her wekî “*pelaxî*” (dema borî) di dema niha de dibe “*pelêx*”, hat (dema borî) di dema niha de dibe hê. Ji bo ku nivîsa me dirêj nebe, nimûneyên *pelaxî* û *hatin* bes in.

Em îcar jî lêkerekê negerguhêz wekî mînak nîşanê bidin. Mesela

bila lêkera me “*çûn*” be. Ev lêker ne gerguhêz e. Heke em raderê wê “-n”yê jê bavêjin, li ber destê me “*çû*” dimîne. Ev jî dibe rayeka dema borî. Îcar em ji rayeka dema borî dengê “-û”yê jê bavêjin, li holê bi tenê “-ç” dimîne. Ev jî rayeka dema niha ye. Dema ku em qer-tafên kesane û yên deman pê ve bikin dê wiha be:

Ez diçim. Tu dê biçî. Ew naçe. (dema niha)

Ez çûm. Tu çûbûyî. Ew neçû. (dema borî)

Piştî van mînanan ez dixwazim bi awayekî kurt mînanan zêde bikim. Min jî bo mînanan ev lêker hîlbijartin:



qedandin, standin, gerandin, kelandin, xwestin, gestin, xistin, lîstin, biraştin, şûştin, gihîştin, kuştin, bijartin, jimartin, girtin, hêrtin, axaftin, quraftin, keftin, pelaxtin, qelabtin, hatin, patin, avêtin, mêtin, rêtin, ajotin, firotin, sotin, gotin, vexwarin, rakirin, hilkirin

LÊKER	RAYEKA DEMA NIHA	RAYEKA DEMA BORÎ
<i>qedandin</i>	qedî	qedand
<i>standin</i>	stî	stand
<i>gerandin</i>	gerî	gerand
<i>kelandin</i>	kelî	keland
<i>xwestin</i>	xwaz	xwest
<i>gestin</i>	gez	gest
<i>xistin</i>	xi	xist
<i>lîstin</i>	lîz	lîst
<i>biraştin</i>	birêj	biraşt
<i>şûştin</i>	şû	şûst
<i>gihîştin</i>	gihîj	gihîst
<i>kuştin</i>	kuj	kuşt
<i>bijartin</i>	bijêr	bijart
<i>jimartin</i>	jimêr	jimart
<i>girtin</i>	gir	girt
<i>hêrtin</i>	hêr	hêrt
<i>axaftin</i>	axêv	axaft
<i>quraftin</i>	qurêf	quraft
<i>keftin</i>	kev	keft
<i>pelaxtin</i>	pelêx	pelaxt
<i>qelabtin</i>	qelêb	qelabt
<i>hatin</i>	hê	hat
<i>patin</i>	pêj	pat
<i>avêtin</i>	avêj	avêt
<i>mêtin</i>	mêj	mêt
<i>rêtin</i>	rêj	rêt
<i>ajotin</i>	ajo	ajot
<i>firotin</i>	firoş	firot
<i>sotin</i>	soj	sot
<i>gotin</i>	bêj	got
<i>vexwarin</i>	xw	xwar
<i>rakirin</i>	raki	rakir
<i>hilkirin</i>	hilki	hilkir



# HALEPÇE

16.03.1988







JI PAŞA AMEDÎ ÇÎROKÊN GELÊRÎ;  
**ÇÛKA KEKO PEKO**